# RÊZIMANA KURDÎ

## AMADEYÎ

## 4

Ev pirtûk, ji aliyê Komîteya Perwerdê ya KCK'ê ve weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.

## AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

***M. Şîrîn Çetin***

***Merwan Yaman***

***Mazlum Tekın***

## Mîzanpaj

***Bedredîn Oy***

## Çapa Yekem: 2015 / Mexmûr

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**



## *EY REQÎB*

***Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman***
***Naşikê û danayê topê zeman***
***Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin***
***Jîn dibe qet nakeve ala Kurda***


***Ême xortên rengê sor û şoreşin***
***Seyr bikin xwîna wî ya rabirdûman***
***Kes nebên Kurd dimirin Kurd jîn dibin***
***Jîn dibe qet na keve ala Kurda***

***Ême xortên Mediya û Keyxusrewin***
***Dîn îman û ayîman her niştîman Kurd û kurdistan***
***Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin***
***Jîn dibe qet nakeve ala Kurda***

***Lawê Kurd rabûye ser pê wek şêran***
***Ta bixwîn nexşîn bikin taca jiyan***
***Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin***
***Jîn dibe qet nakeve ala Kurda***

***Xortê nû tev hazir û amedene***
***Canfîdane canfîda her canfîda***
***Kes nebê Kurd dimirin Kurd jîn dibin***
***Jîn dibe qet nakeve ala Kurda***

***Yûnûs RAÛF (DILDAR)-1946***



“**Bêguman emê wêjeya demê Neolotîkê pêkbînîn.”**
***Rêber APO***

# NAVEROK

**BEŞA I** ..... **9**

ZIMAN ÇI YE Û DI ALIYÊ BINYATÊ DE TÊKILIYA ZIMANÊ KURDÎ Û ZIMANÊN CÎHANÊ ..... 9
ZIMAN ÇI YE? ..... 9
DERKETINA ZIMAN ..... 11
HINEK TAYBETMENDIYÊN ZIMAN ..... 13
QONAXA ZANÎNA ZIMAN ..... 16
JI ZANÎNA ZIMAN DERBAZBÛNA QONAXA ZANISTA ZIMAN ..... 16
FÎLOLOJÎ (QONAXA ZANISTA MIJARÊ) ..... 16
QONAXA ZANISTA ZIMAN ..... 17
REWŞA ZIMAN ..... 18
JI ALIYÊ BINYATÊ VE MALBATÊN ZIMANÊN CÎHANÊ ..... 20
BINYATA ZIMANÊ KURDÎ ..... 21
TEST ..... 23

**BEŞA II** ..... **24**

AWAYÊ BIKARANÎNA DENG Û PEYVAN ..... 23
BERAMBERKIRINA KURDIYA KEVIN Û NÛ ..... 23
HINEK XWESERIYÊN DENGDÊRAN ..... 26
HINEK XWESERIYÊN DENGDARAN ..... 28
GUHERÎN Û VEGUHERÎNA DENGAN ..... 29
GUHERÎN Û VEGUHERÎNA DENGDÊRAN ..... 36
BI HEVGUHERTINA DENGDÊRÊN KURT Û DIRÊJ ..... 38
***TEST*** ..... 40

**BEŞA III** ..... **43**

PEYV ..... 43
WATENASÎ ..... 44
PEYV Û CÛRÊN WAN ..... 45
1-PEYVA KAR ..... 45
A- KOK ..... 2
B- GEWDEYA KAR ..... 48
GEWDEYA NAV ..... 53
SALOX ..... 2
DI RAWEYAN DE ÇARESERIYA GEWDEYAN ..... 57
JÊDERÊN KARÊN TÊPER Û NETÊPERAN ..... 60
HEVSENGIYA DI NAVBERA KAR Û ENDAMÊN DIN YÊN HEVOKÊ DE ..... 67
KARÊN TEBATÎ Û LEBATÎ ..... 73
2- PEYVA NAV ..... 75

A- NAV ....... 75
DI KARANÎNA HEVOKÊ DE ÇARESERKIRINA NAVAN ....... 78
B-CÎNAV ....... 79
LI GEL NAV HATINA CÎNAVAN ....... 83
C- HEVALNAV ....... 85
D- HEVALKAR ....... 87
3- PEYVÊN ALAV ....... 89
BEŞÊN ALAVAN ....... 89
***TEST*** ....... 91

**BEŞA IV ....... 95**

A- ZAGONÊN RASTNIVÎSÎNÊ ....... 95
A- NIVÎSÎNA TÎPÊN MEZIN ....... 95
B- NIVÎSÎNA NAVÊ CIHAN ....... 96
C- NIVÎSÎNA HATÎ KURKIRIN ....... 97
Ç- NIVÎSANDINA JIMARAN ....... 97
D- NIVÎSANDINA NAVÊN BERAN (ALÎ) ....... 97
E- NIVÎSANDINA DÎROKAN ....... 97
Ê- NIVÎSANDINA NAVÊN HEVGIRTÎ ....... 98
F- NIVÎSANDINA CÎNAVÊN XWEMALÎ ....... 99
G- NIVÎSANDINA DAÇEKAN ....... 99
H- NIVÎSANDINA PÊVEKÊN ERÊNÎ Û NERÊNÎ ....... 99
I- NIVÎSANDINA PEYVÊN PIRSYARÎ ....... 100
Î- NIVÎSANDINA HEVALNAVÊN NEDIYAR ....... 100
B- HÊMADANÎN ....... 101
***TEST*** ....... 109

# BEŞA I

## ZIMAN ÇI YE Û DI ALIYÊ BINYATÊ DE TÊKILIYA ZIMANÊ KURDÎ Û ZIMANÊN CÎHANÊ

### XEBATÊN AMADEKARÎ


**1- Gelo ziman tenê bi têgihandina mirovan ve sînordare?**
**2- Em çawa dikarin zimanekê têgihayî bikarbînin?**

### ZIMAN ÇI YE?

Ziman, civakan li ser lingan digire. Yê ku parçebûna netewan ji tinebûnê rizgar dike; yekîtiya hest, raman, bawerî û çandê ye. Yê ku vê yekîtiyê çêdike û digihîne nifşê bê, zimane. Ziman ne tenê bi têgihandina mirovan ve sînordar, di heman demê de civakê bi hev ve girê dide û çanda şirîk pêktîne.

Ziman heyînek berfirehe. Ji beriya hertiştî amêreke ku têgihandina mirovan pêktîne. Mirov; hest, raman û hemû nirxên xwe yên hilberandî, bi ziman têdigihîne. Ev hest, raman û nirxên ku mirovan afirandî, ziman bihêz dike û ziman jî pêşketina wan çêdike. Hinek destûr û zagonên xweser yên ziman hene. Ziman di nava van destûr û zagonan de pêşdikeve, xwedî çêbûnek zindî û di nava demê de her tim xwe nû dike. Ziman di heman demê de malê gel yê hevpare. Hêza xwe ji çanda gel digire. Ji ber vê çendê, ziman ji bo civakê gelek girînge. Ziman yek ji endamên herî girîng yê civakê bi hev ve girêdideye.

Divê hertim ziman bi awayekê sade û têgihiştî bêbikaranîn. Herwiha tiştên ku em dixwazin bidin têgihandin, divê yê li beramberî me bi hêsanî têbigihe.




## LÊKOLÎN

**1- Girîngiya ziman di hevdû têgihandina mirovan de çi ye?**
**2- Di pêşxistin û parastina çandê de, girîngiya ziman çi ye?**
**3- Çima ziman endamek herî girînge ku civakê bi hev ve girêdide?**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Gelo hûn hizirîne, zimanê hûn pê daxivin bi çi awayî derketiye holê?
2- Ma li gor we, axaftin û sazûmankirina axaftinê çawa çêbuye û çawa derbazî nivîsînê buye?

## DERKETINA ZIMAN



Her tim hatiye mereqkirin ka mirov kengê, çawa, bi kîjan zimanî axiviye. Destpêkê kîjan peyv gotiye. Bersiva vê, pir zore. Mijarên nivîskî bes karîne bûriyek nêzîk ronî bikin. Pelgeyên Sumeran yên weke; pelgeyên herî kevnar tên dîtin jî bes karîne 5500 salên beriya niha ronî bikin. Mirov jî, ji berî van deman jiyan bûne. Tişta herî tê bawerkirin, axaftina weke çengek yê zimane, destpêkê derketiye, piştre hêmayên ku wê diyar dikin, nivîsîn derketiye holê.

Di vir de mijara bê diyarkirin ewe ku pirsgirêka derketina ziman, bi riya zanistan û zanista mergî tê lêkolînkirin. Piştî salên 1995’an û vir ve, ev ji aliyê zanista genetîk ve jî tê lêlolînkirin. Dixwazin bersiva vê pirsê bi riya lêkolînên li ser DNA’yê bidin. Gelek nivîskar bawer dikin ku lêkolîna zimanê zarok, wê rê bide bersivdayîna vê mijara tê zanîn. Ev pirsgirêk berî zayînê bi 500 salan ji aliyê gelek zimanzanên navdarên cîhanê (Hindî, Rûm, Kurd...) ve tê lêkolînkirin. Zimanzanên Ereb jî, ji Çerxa Navîn heya sedesala 18’an, ji bo awayê derketina ziman derxin holê, xebatên mezin kirine. Lêkolîna desthilatê Misrê bi vî awayî ye: Di sedsala 17’an de desthilatê Misrê Psammetîkos mereq dike ka gelo kesekê ti tişt nebihîstî, wê bi kîjan zimanî baxive. Ji bo vê têbigihe, dû zarokên nû ji dayîk bûyîn yên di heman demê de çêbuyîn, dide şivanekê û dibêje: “Van xwedî bike, bi wan re nepeyîve û divê ti kes li gel wan naxive.” Ev zarok wê bi hev re mezin bibin, wê şivan di demjimêrek diyar de pezê xwe bîne, wan têr bike, paşê wê biçe karê xwe. Rojekê şivan dema ji bo wan têr bike, diçe oda wan, dibîne herduwan destên xwe rakirine û dibêjin: “**Bekos**” û didin qêra. Ev rewş çend rojan dewam dike. Şivan, zarokan dibe dîwanxana desthilatê Misrê. Psammetîkos jî dibîne, zarokê wisa dibêjin:“Bekos” di zimanê Frîgyayî yan de tê wateya “Nan”. Psammetîkos digihe wê baweriyê ku ziman di encama pêwîstiyê de derketiye û zimanê destpêkê zimanê Frîgyayî ye. Lê kesên dibêjin ku destpêkê zimanê hatî axaftin, Sumerî, Elmanî, Farisî, Kurdî û ... hene.

Ceribandinên bi vî awayî di salên dawî de jî çêbûne. Zanyarên îro bawerdikin ku ceribandinên berê şaşin û dibêjin zarokên nebihîsin wê lalbin (wê naxivin).

**LÊKOLÎN**

**1- Li gorî we zimanê destpêkê derketî kîjane û çima?**
**2- Zanyarên îro lêkolînên kevin napejirînin. Nêrînên xwe yên li ser vê mijarê diyarbikin.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1- Hûn carnan fêrî taybetmendiyên ziman bûne?**
**2- Hûn dizanin ziman heyînek zindiye? Çima?**

## HINEK TAYBETMENDIYÊN ZIMAN

➔Ziman amêrek ya têgihandinê ye. Mirov; hest, raman, xwestek û daxwazên xwe bi alîkariya ziman digihîne mirovên beramberî xwe.

➔Bingehê ziman di demek nayê zanîn de hatiye destpêkirin. Ziman nayê zanîn ku çawa û kengê derketiye holê.

➔Ziman desteyek ya destûrane. Her ziman xwediyê zagonên xweserin. Her dengê ku ji devê me derdikeve, peyvînê pêknayîne. Ev deng di nava destûrek diyar de tên gel hev; kiteyê, dema ev kite hatin gel hev; peyv, dema peyv hatin gel hev, hevokê çêdikin. Ha, anîna van ya li gel hev, di nava destûrek diyar de çêdibe. Ev hevokên ku darezandinekê didin zanîn, xwestekekê têdigihînin.

➔Ziman û çand dû endamên ji hev nayên qutkirinin. Ziman taybetmendiyên çanda civakekê digire nava xwe. Endamê herî girîng yê çandê, ziman, di heman demê de pêşkeftina çandê pêktîne. Bi alîkariya ziman, çand digihe nifşê nû.

➔Ziman amêrekê xwezayî ye. Ziman naşibe amêrek ya mirov bikartîne. Amêra ku mirovan bi xwe afirandî, dikare bi her awayî ber biditê. Lê xwezaya ziman ji vê re dibe asteng. Destûrên ziman yên xweser hene. Mirov hervsengiyê bi van destûran re çêbike, dikare sûdê ji ziman bigire. Ziman ne amerekê bidest çêkiriye.

➔Ziman saziyek civakiye. Mirov heyînekê civakî û zindiye. Bi tena serê xwe nikare bijî. Neçare di nava civakan de li gel civakekê bijî. Zimanê ku civakek bikartîne, saziyek civakiye. Mirov bi kêrhatina axaftinê re, ji dayîk dibe, lê zimanê ku ew bikar bîne, di nava civaka jê dayîkbuyî de, berê heye.

Yanî zimanê kes amadeye. Ziman malê civakê yê hevpare û saziyek ya hemû civakê digire nava xwe ye.

➔Ziman, ramanê bandor dike. Mijarek ya rê li ber nîqaşê vêdike ûpirsa; "Hizir, ziman afirandiye, yan ziman hizir afirandiye?" tê kirin. Rastiyek heye ku ev herdû têgeh ji hevdû bandor bûne. Ziman dewlemendiye, hizir jî nîşaneya dewlemendiyekê ye.

➔Ziman heyînek zindiye. Ziman, di rasteka destûrên xwe de heyînek zindî ya pêşdikeve ye. Ziman jî weke heyînek zindî ji dayîk dibe, mezin dibe, pêşdikeve, tê nûvejenkirin û dimire. Mînaka vê ya herî xweşik, endama ku ziman çêdike, weke; peyv, di nava demê de bi guhertinan re rû bi rû dibe.

## LÊKOLÎN

1- Çima ziman ramanê bandor dike? Lêkolîn bikin.
2- Taybetmendiyên Zimanê Kurdî lêkolîn bikin.

## PÊŞBAZÎ

Di mijara jorî de girêdayî taybetmendiyên ziman, heşt xal hatine rêzkirin. Hûn jî di refê de, ji bo her xalekê gurubekê sazbikin û girêdayî xala xwe lêkolînan pêşbêxin.



## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1- Li gorî we, cudahiyek di navbera Zanîna Ziman û Zanista Ziman de heye?**
**2- Ma hûn dizanin Filolojî çi ye? Bihizirin.**

# JI ZANÎNA ZIMAN DERBASBÛNA QONAXA ZANISTA ZIMAN

## Qonaxa Zanîna Ziman

Zanîna ziman, ji beriya zayînê di sedsala 5'an de destpêkiriye û di heman demê de, di gelek hêlan de destbi lêkolînkirina ziman têkirin û gelek zagon ji ziman re tên danîn.

## Fîlolojî (Qonaxa Zanista Mijarê)



Fîlolojî, zanistek ya çêbûn û pêşkeftina zimanan ya dîrokî û têkiliya zimanan ya bi hevdu re lêkolîn dike. Di Yunana kevin de, di encama hevgirtina herdû peyvên weke; "**Philo**" (hezkirin) û "**Logos**" (peyv) de derketiye holê. Herwiha weke; "**Hezkirina Peyvê**" tê binavkirin. Fîlolojî, zanistekê dîrokî ya pêkhatina pelgeyên nivîskî, ka çiqas ahengî rastiyane, lêkolîn dike. Di xebatên Fîlolojiyê de, mijarên berê yên girêdayî demê hatîn hilberandin, lêkolîn dike û ji nû ve pêktîne. Bandoriyên berhemên demê û çavkaniya wan lêkolîn dike. Herwiha di sedesala 17'an de destpêdike. Zimanê neteweke û mijarên ku ji wî zîmanî re hatîn nivîsandin, lêkolîn dike. Ev qonaxa ku zanista ziman derbazkirî, mirov nikare bêje qonaxa zanîna ziman lêkolîn dike. Di vê qonaxê de hêj bêhtir awayê derbasbûna ziman ya mijaran û wêjeyê lêkolîn dike.

## Qonaxa Zanista Ziman

Qonaxa zanista ziman, di sedsala 19'an de destpê dike. Ziman di wateya giştî de weke sîstemek ya têgihandin û ragihandinê derdikeve pêş. Guhertinên civakî û çandî, pêşketina dîroka ziman tê destgirtin û piştre zanista ziman derbazî çarçoveyek nû dibe.

**Cudahiyên di navbera zanista ziman û zanîna ziman de**

| Zanista Ziman | Zanîna Ziman |
|---|---|
| Zanista ziman; hemû zimanên ku xwe gihandiyê, kirine mijar. Dîroka van zimanan lêkolîn dike. Malbata ziman û hemû xetên qonaxa zimanan diyar dike. | Zanîna ziman; zimanekî di nava sîstemek diyar de lêkolîn dike û digire dest. |
| Zanista ziman; pêşkeftina gerdûnî û herdemî ya hemû zimanan digire dest, van zimanan lêkolîn dike û zagonên giştî ji wan re diyar dike. | Zanîna ziman; deng, awa, çêbûn û rêzepeyvên zimanekî, têkiliya wan digire dest û zagonên wan diyar dike. |
| Zanista ziman; tixûbê zimanan diyar dike, di nava van tixûban de, ziman xwe bi xwe pênase dike. | Zanîna ziman; destûrên zimanekî diyar dikin. Ev destûr çawa rast û xweşik tên bikaranîn, nîşa dike. |
| Zanista ziman; ne ya pêwîstî pê heyî, ya heyî lêkolîn dike. | Zanîna ziman; ji me re ya bi destûr û rast ji ya çewt cuda dike; ji bo zanîna pêwîst, ji me re dibe alîkar. |
| Zanista ziman; bi ti awayî destwerdanê li ser ziman çênake. Pêkhateya ziman tenê bigiştî girêdana têkiliyên sedem û encamê çêdike. | Zanîna ziman; dikare dembidem bi hêcatan destûran biguhere, nuvejen bike yan jî ji bo pêşkeftina ziman hin destûrên nû bafirîne. |


### LÊKOLÎN

1- Rewşa Zimanê Kurdî ya beriya zayînê lêkolîn bikin.
2- Ciyewaziya di navbera Fîlolojî û zanîna ziman de bibînin û li ser vê ciyewaziyê mijarekê binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1- Ji bo ziman tine nebe, pêwîste civaka girêdayî wî zimanî çi bike?**
**2- Li gorî we çima beşek mezin yê zimanên cîhanê berbi tinebûnê ve diçin?**

## REWŞA ZIMAN




Di roja me ya îro de, bi awayek diramatîk ziman tê nirxandin. Gelek ziman ewqas zû dimirin ku dema em bêjin di dîroka mirovahiyê de rewşek wisa diramatîk derketiye holê, neşaşe. Li gorî hizirînên herî erênî, piştî sed salên din, wê ji zimanên niha heyî, ji sêyan yekê wan bimînin û yên din wê tine bibin. Li gorî hinek hizirînên nerênî dibêjin; ji zimanên tên axaftin bes wê ji sedan dehbikarin xwe jiyanbike. Niha zimanên heyî, ji sedan bîstê wan ketine rewşa zimanê mirî de. Kesên bi van zimanan daxivin gelek kêmin. Hinek dibêjin pênc, hinek dibêjin bîst kes bi hinek zimanan daxivin. Dîsa ji zimanên niha pê tên axaftin, ji sedan bîstê wan ji mirinê re hatine berdan. Ji ber nifşê nû û zarok bi van zimanan naxivin û nayên fêrkirin. Dîsa ji zimanên îro pê tên axaftin, ji sedan pêncî jî ji ber kêm pê tê axaftin, di demê pêş de dikarin bi tinebûnê re rû bi rû bimînin.

Gefa li ser tinekirina ziman, bêguman aborî û globalîzma ramyariye. Li gel wan çapemenî, televizyon û çêkirina filîman jî cih digirin. Sedemek din, bêguman şer, netew-perestî û qedexeyên ku tên zanînin. Mixabin di vê mijarê de jî “Darwînizm” yanî yên bihêz qezenc dikin. Dema li nexşeya ziman ya cîhanê tê nêrîn, dîtina vê pêkane. Ji ber mirov berê xwe didin hinek zimanan, newekheviyek di belavbûna zimanan ya li ser parzemîn û dewletan de çêbuye.

Li hemberî hinek zimanên kêm, pirbûna axaftvanan û hinek zimanên zêde, pir kêmbûna axaftvanên wan tê dîtin. Di roja me de zimanên tên bikaranîn, hinek jê ji sedan duwê wan heft milyon pê daxivin, hinek jê ji sedan notê wan bes pênc hezar pê daxivin.

Dema em deh zimanên herî mezin yên cîhanê bigirin dest, zaraveyê zimanê Çînî yê binavê “**Mandarîn**” yê herî pê tê axaftine û axaftvanên wê 900 milyone. Ev tê wateya ji seda pazdeyê şêniya cîhanê. Ziman Çînî, zimanê Hînd-Ewrûpî, dişopîne. Zimanê Îspanyolî 330 milyon, Inglîzî 120 milyon, Bengalî 190 milyon, Hindî 180 milyon, Portekîzî 170 milyon, Rûsî 170 milyon û zimanên ji dervey van Japonî jî ji aliyê 125 milyon mirov ve tê axaftin. Dîsa Elmanî 98, wu Çînî jî 90 milyon kes pê taxivin. Kesên bi van her deh zimanên mezin taxivin, ji sedan 42.5’ê şêniya cîhanê pêktînin.


Birên zimanên Hind-Ewrûpî bi hemû endamên xwe ve xwediyê 2 milyar û 300 milyon axaftvanane û guruba herî mezine. Li pey vê, zimanê Çînî bi milyarek û 200 milyonan wê dişopîne. Ji sed zimanên cîhanê yên herî pê tên axaftinn 40’ê wan, guruba zimanên Hind-Ewrûpî pêktinin. Ew jî evin; Hindî, Latîn (Romenî, Germenî, Slavî, Farisî, Kurdî, Yunanî...). Ziman û birên zimanên din jî evin: Daravîdî (Başûrê Hindistan û Srîlanka), Erebî, Endenûzî, Zimanê Altayî, Japonî, Koreyî û Flîpînî. Li Efrîqa jî hinek zimanên mezin yên weke: Haûsa, Zorûbaî, Igbo peyda dibin. Lê di nava van zimanên mezin de, zimanê Emerîka yê xwecihî yanî zimanê Îndîgene, zimanê xwecihî yê Awusturalya û Gîneya Nû cih nagirin.

Li gorî jimara şêniya Asyayê pênc car qasî Efrîqaye, lê jimara zimanên wan hema hema qasî hevin.

Di roja me de, zimanên metirsiya tinebûnê li ser wan tine, pir kêmin. Komên ziman di aliyê peyvsazî, rêziman û çêbûnê de, bi hev re di nava têkiliyê de ne. Ev têkiliya erênî, bi desthilatîkirina yekçandî û yekzimaniyê berbi xirabûnê ve diçe.

## JI ALIYÊ BINYATÊ VE MALBATÊN ZIMANÊN CÎHANÊ

| Zimanên Cînanê Ji Aliyê Malbatî ve Bi vî Awayîye | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **Aryanî (Hind-Ewrûpî)** | | | | **Hamî Samî** | **Çîn-Tîbet** | **Bantû** | **Ural-Altay** | |
| **Beşê Asya** | **Beşê Ewrûpa** | | | Erebî<br>Îbranî<br>Hebeşî<br>Suryanî | Çînî<br>Tîbetî | Zimanên Efrîqa | **Z.Uralî** | **Z.Altayî** |
| Kurdî<br>Hindî<br>Farisî<br>Belûcî<br>Peştuyî | **Z.Latînî** | **Z.Germenî** | **Z.Silavî** | | | | Macarî<br>Fînî<br>Estonî | Tirkî<br>Moxolî<br>Koreyî<br>Japonî<br>Mançûyî<br>Tongozî |
| | Îtalî<br>Îspanyolî<br>Fransî<br>Portekîzî<br>Arnawidî<br>Romenî | Elmanî<br>Ingilîzî<br>Holandî | Rûsî<br>Bulgarî<br>Sirbî<br>Hirwadî<br>Çekî<br>Lehî | | | | | |



## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1- Perestgehên Xirabreşkê dikeve kîjan bajarê Kurdistanê?**
**2- Ji bo têgihiştina dewlemendî û kevnerbûna zimanê Kurdî, mirov dikare ji Perestgehên Xirabreşkê sûd bigire?**

## BINYATA ZIMANÊ KURDÎ



Ziman, amêrek ya têgihandinê ye. Têgihandina civakê hêj di şoreşa Neolotîk de pêşketiye. Şoreşa Neolotîk bingehê şoreşa ziman afirandiye. Şoreşa Neolotîk û ziman li ser bingehê çandiniyê pêşketine. Şoreşa Neolotîk ya ku bingehê xwe yekser ji çanda Aryaniyan digire, hêzê dide şoreşa ziman jî.

Çanda Aryaniyan, li gor arkeologan di perestgehên Xirabreşkê de, bingehê xwe berî zayînê 12 hezar salan avêtiye. Çanda Aryanî di heman demê de weke koma zimanê Aryanî jî tê binavkirin. Koma zimanê Aryanî, serperiştiya koma zimanên cîhanê dike. Li ser vî bingehî, bi pêşkeftina hilberînê re binyatên ziman kom bi kom ji hev tên cudakirin. Zimanê Kurdî jî, di nava koma zimanên Aryanî de cih digire. Koma Aryanî, koma zimanên cîhanê ya herî mezin, dewlemend û kevnare. Herwiha weke koma zimanên Hînd-Ewrûpî jî tê binavkirin. Koma zimanê Aryanî, dibe dû beş; Beşê Asya, beşê Ewrûpa.

Zimanê Kurdî, piştî çanda Aryaniyan bi navê çanda Hurî û Medan hatiye pêşxistin. Herwiha zimanê Kurdî bi taybet binavê Huriyan gelek pêşkeftinên baş bidest xistine. Di serdema Medan de jî, vê pêşkeftinê xwe gihandiye gimikê. Piştî zayînê, di sedsala XIV'an de pelgeyek hatiye dîtin ku di wê pelgeyê de, duayekê Medî vê pêşketina zimanê Kurdî di dema Medan de piştrast dike.

**Medî;**
"Pakêj xodê, pakêj zehm, pakêj vêmerg, koy hatî xaçê eş kirme rehmetê ma."

**Kurdiya nû;**
"Paqij xudê, paqij zexm, paqij bêmirin ku hatî xaçê, rehmet bike li me."

**LÊKOLÎN**

1- Koma zimanê Aryaniyan lêkolîn bikin.
2- Li gorî arkeologan, li Perestgeha Xirabreşkê çi hatiye dîtin û di encama wê de mirovahî gihaye kîjan encaman?



**Dîmenên Resen Ji Pirtuka Pîroz-Awesta**




**1-Ziman hêza xwe ji çi digre?**
a-Ji Dîrokê.
b-Ji Erdnîgariyê.
c-Ji Folklorê.
d-Ji Çanda Gel.
e-Ji Derûnasiyê.

**2-Kîjan teybetmendiyên li jêr teybetmendiyên zimane?**
a-Demboriya xwe lêkolîn dike.
b-Pêşeroja civakê lêkolîn dike.
c-Mîtolojiya civakê lêkolîn dike.
d-Dewlemendiyên erdnîgariyê lêkolîn dike.
e-Amêrek ya têgihandinê ye.

**3-Fîlolojî çi lêkolîn dike?**
a-Zanistek ya çêbûn û pêşkeftina zimanan ya dîrokî û têkiliya ziman ya bi hevdure lêkolîn dike.
b-Zanistek ya civaknasiya civakekê lêkolîn dike.
c-Zanistek ya peyvê lêkolîn dike.
d-Zanistek ya pêşkeftinên mirovahiyê lêkolîn dike.
e-Zanistek ya heyînên xwezayî lêkolîn dike.

**4-Qonaxa zanista ziman di kîjan sedsalê de destpê kiriye.?**
a-Di sedsala 17 de destpê kiriye.
b-Di sedsala 18 de destpê kiriye.
c-Di sedsala 19 de destpê kiriye.
d-Di sedsala 20 de destpê kiriye.
e-Di sedsala 21 de destpê kiriye.

**5-Malbatên zimanê Cîhanê ji aliyê binyatê ve dibin çend beş.?**
a-2
b-3
c-4
d-5
e-6

**6-Zimanê Kurdî di aliyêbinyatê de di nava kîjan malbatên Zimanên Cîhanê de cih digre?**
a-Hamî-Samî. b-Aryanî -(Hînd-Evrûpî) c-Ural-Altay d-Bantûe-  Çîn-Tîbet

# BEŞA II

## DAXUYANÎ

**Ji ber salên bûrî em li ser tîp, peyv, birepeyv, palvedariya navan, raveka hevalnavan, hevok û endamên hevokan rawestabûn, di pirtûka rêzimana çarê de jî emê li ser awayê nivîsîna peyvê, rast nivîsîna wê, sazûmankirina hevokê, dîsa bandora nav û cînavan di nava hevokê de, cudabûna nivîsîna nav û cînavan li gor deman, herwiha emê li ser egerê çawa nivîsîna peyv û hevokan rawestîn.**

**Ji bo mijar hêj zelaltir bê têgihandin, emê ji bo her çêbûnekê hevokên cuda bikar bînîn û çareser bikîn. Bi vê yekê re emê hewil bidîn çareseriyên hevokan yên berê hatîn dayîn hêj bêhtir bidîn têgihandin.**

## AWAYÊ BIKARANÎNA DENG Û PEYVAN

## BERAMBERKIRINA KURDIYA KEVIN Û NÛ



Di zimanê Kurdî de, hinek deng hene di navbera dengdêran de weke pirekê tên bikaranîn. Ev deng, herçiqas dengdarbin jî, di dema anîna ziman de weke dengdêran li cihekê na aliqin û bihêsanî ji devê mirov derdikevin. Ji ber vê taybetmendiya xwe nêzikî dengdêranin. Lewra ji van dengan re nîvdengdêr yan jî tîpên siwar tên gotin. Herwiha rolek van ya bingehîn heye. Bitaybet rola tipên siwar di Kurdiya kevin de pire. Lê belê wisa xwiya dike ku di zimanê Kurdî de, bitaybet tîpa "**h**" ya ku ji bo asan xwendina peyvê, di Kurdiya kevin de, di destpêka peyvan de hatiye bikaranîn. Bi berdewamkirina demê re, ev rewş ji holê rabuye. Peyvên ku berê bi tîpên siwar dihatin destpêkirin, ji ber sivikbûna peyvê tîpa siwar rabuye û niha jî bi tîpa dengdêr destpê dike.

**Mînak:**

| Kurdiya Kevin | Kurdiya Nû |
|---|---|
| Havêtin | Avêtin |
| Hanîn | Anîn |
| Herê | Erê |
| Heger | Eger |
| Hêsan | Asan |
| Hêriş | Êriş |
| Hêş | Êş |
| Hewir | Ewir |
| Hêdî | Êdî |
| Histiran | Stiran |

Ev guhertina dengan buye sedama wê yekê ku dû tîpên dengdêr bên gel hev û aloziyek nû derbêxin holê. Herçiqas ev alozî bi riya avêtina hinek dengdêran hatibin çareser kirin, lê peyvên nehatîn çareserkirin jî hene.

**Mînak:**

Biewre
Biêşe
Biave

**LÊKOLÎN**

1- Hûn jî hinek peyvên ku di Kurdiya kevin de bi tîpa dengdar dihatin destpêkirin û niha bi tîpa dengdêr tên destpêkirin bibînin.
2- Hinek peyvên bi Kurdiya nû jî dîsa nekarîne xwe ji tîpa destpêkê ya dengdar rizgar bikin û her bi rengê xwe mane, bibînin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1- Sûdên dengdêran di herikandina dengsaziyê de çi ye?**
**2- Hûn dizanin kîjan dengdêr li pêşiya kîjan dengdarê nayê?**

## HINEK XWESERIYÊN DENGDÊRAN

Her weke me berê niha jî gotibû, di rêzimana Kurdî de tişta ku herî zêde bandorê li rastnivîsînê dike, dengsaziye. Di dengsaziya Kurdî de, hin tiştên ku divê di serî de bêne zanîn hene.

Di zimanê Kurdî de, hinek dengdêr hene ku nikarin bikevin pêşî yan paşiya hinek dengdaran.

**Dengdêra** "**i**"

Bi awayekê giştî nakeve destpêk û dawiya peyvan (ji dervey daçekan). Lê divê neyê jibîrkirin ku di hinek herêmên Botanê de, li dawiya peyvê tê bikaranîn. Dengdêra "**i**", dikare li destpêk yan jî li dawiya peyvên ji zamanê biyanî hatî girtin, bê karanîn.

**Dengdêra** "**u**"

Ev dengdêr, bi awayekê giştî dikeve piştî dengdarên "**g, h, k, q, x**". Lê piştî dengdarên din pir kêm tê bikaranîn.

**Mînak:** Hundir, guh, gul, Kurd, guman, kurt, qul, qurm, qulf, xurt, xurîn...

Herwiha ev dengdêra me di zaravê Kurmancî de, bi awayekê giştî nakeve destpêk û dawiya peyvan. Bê guman awarteyên wê jî hene.

**Dengdêrên** **"ê - î"**

Ev her dû dengdêr, ti caran nakevin pêşiya dengdara "**y**". Ger bê jî, cihê xwe ji dengdêra "**i**" re dihêle.

**Mînak:**

Dê - diya min
Rê - riya min
Derî - deriyê me

**Dengdêra** **"û"**

Dengdêra "**û**" ti caran nakeve pêşiya dengdara "**w**". Lê dema hatina van her dû dengan ya li gel hev naçarî be, wê demê "**û**" cihê xwe ji "**u**" re dihêle.

**Mînak**

Dû - duwemîn
Rû - ruwê te

## LÊKOLÎN

1- Hinek peyvên biyanî yên ku dengdêra “i” li pêşiyê hatine karanîn binivîsin.
2- Dema dengê “û - w” hatin li gel hev, dengdêra “û” cihê xwe ji kîjan dengdêrê re dihêle? Bi mînakan vekin.



## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1- Dema dû tîpên dengdar rastî hev tên, pêwîste çi bê kirin?**
**2- Li gorî we kengê dengdara "s" cihê xwe ji "z" yê re dihêle?**

## HINEK XWESERIYÊN DENGDARAN

Di zimanê Kurdî de,li pey hev bikaranîna dû dengdarên heman, nepêkane. Lê ger hatina wan ya li gel hev neçarî be, pêwîste yek bikeve û yek bimîne.

**Mînak:**

Xurt + tir = xurtir
Rast + tir = rastir
Kurt + tir = kurtir

**Dengdara "s"**

Dengdara "**s**", dema li pey dengdêrekê tê, hinek tuj weke dengê "**z**" tê xwendin. Ev awayê anîna ziman nakeve nivîsandinê, dengdara "**s**" her weke xwe tê nivîsandin û bi "**z**" yê nayê guhertin.

**Mînak:**

| Awayê Nivîsînê | Awayê Xwendinê |
|---|---|
| **Selete** | **Zelete** |
| **Derbas** | **Derbaz** |
| **Pesin** | **Pezin** |



**LÊKOLÎN**

1- Di Kurdî de hinek peyvên ku tê de dû tîpên dengdar hatine karanîn bibînin.
2- Hûn jî çend peyvên ku têde tîpa "s" heyî û bi tîpa "z" tê xwendin bibînin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1 Ma pêkane di peyvekê de li şûna tîpekê, tîpek din bê bikaranîn? Çima?**
**2- Veguherîna tîpan di navbera zaraveyê Kurmancî û Soranî de bi çi awayî çêdibe?**
**3- Dema di Kurmancî de li şûna "v" "m" bê bikaranîn, wê kîjan peyva ji kîjan zaraveyî derkeve hole?**
**4- Li gorî we di Kurmancî de peyvên şaş tên gotin hene? Ger hebin, çima?**



## GUHERÎN Û VEGUHERÎNA DENGAN

Guherîn û veguherîna dengan, awayê peyvan diguhere. Dibe sedem ku peyvek bi çend awayan derbikeve pêşberî mirov. Gelek kes dixwazin awayê herêma xwe derbasî nivîsînê bikin. Ev jî rê li ber pêkhatina zimanek hevgirtî digire. Ji ber guherîna di Kurdiya devokî de bi lez û beze, di aliyê rastnivîsînê de, bitaybet di zaravê Kurmancî de, sergêjahiyekê dertêxe holê. Ji ber guherîna dengan li her herêmê ne weke heve, devokên cuda cuda derketine holê. Li vir nepêkan û nepêwîste ku em tevayî bihevguhertina dengan bidin. Lê dîsan jî divê em hinek mînakan bidin têgihandin.

Guherîna dengan, li gor sedem û bingeha xwe ji hev cuda dibin. Carnan dengên ji cihekê derdikevin, yek tê daqurtandin.

**Mînak:**

Xurt + tir = xurtir

Yan dengekê din dişibîne xwe.

**Mînak:**

Serjêkirin = Şerjêkirin

Bi hevguherîna dengan, bingeha xwe ji demê kevin digire. Dema mirov Kurdî û Farisî berambar bike, vê yekê dikare bibîne.

Ev guherîn ji dîrokê tê. Ev guherîna dengan, di demê cudabûna komên zimanê Aryanî de pêkhatiye. Hinek guhertin jî bingeha xwe ji zaravan digirin. Dema ku mirov dû

zaravan beramber dike, mirov vê yekê bi awayek zelaltir dibîne. Dema em Kurmancî û Soranî tînîn li gel hev, vê yekê dibînîn. Ji ber dengê “**v**” di Soranî de nîne, li şûna wê dengê “**w**” tê bikaranîn.

**Mînak:**

| Kurmancî | Soranî |
|---|---|
| **Şev** | **Şew** |
| **Av** | **Aw** |

Dema peyv ji zaravê Soranî tê girtîn, weke heyî tê nivîsîn. Ev dibe sedema aloziyên di zaraveyê Kurmancî de.

**Mînak:**

| Kurmancî | Soranî |
|---|---|
| **Çav** | **Çaw** |
| **Gav** | **Gaw** |
| **Şivan** | **Şiwan** |
| **Gavan** | **Gawan** |

Herwiha di navabera zaravên Kurmancî û Dumilkî de jî cudahiya hinek dengan heye.

**Dengên “v - m”**

**Mînak:**

| Kurmancî | Dumilkî |
|---|---|
| **Nav** | **Nam** |
| **Çav** | **Çim** |
| **Nîv** | **Nîm** |
| **Duv** | **Dîm** |

**Dengê “j - z”**

**Mînak:**

| Kurmancî | Dumilkî |
|---|---|
| **Roj** | **Roz** |
| **Jî** | **Zî** |
| **Ez jî** | **Ez zî** |

Divê em diyar bikîn ku devokên Kurmancî jî di vî warî de ji hev cuda dibin.

**Mînak:**

| Devoka Şemzînan | Devoka Cizîr |
|---|---|
| Weke | Veke |
| Hewal | Heval |
| Aw | Av |

Herwiha dema em li devokên zaravê Kurmancî dinêrîn, di peyvên wan de guherînên cûr be cûr dibînîn.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| Nivîs | Niwîs |
| Şev | Şew |
| Govend | Gowend |
| Av | Aw |

Peyvên di qotiya bi navê “**peyvên rast tên karanîn**” de hatîn nivîsîn, peyvên rastin. Yên di qotiya bi navê “peyvên çewt tên karanîn” de hatîn nivîsîn, peyvên çewtin.

**Dengên “b - p”**

Ev her dû deng jî, di gelek peyvan de cihê xwe ji hev re dihêlin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| Biçûk | Piçûk |
| Bişaftin | Pişaftin |

Di van mînakan de, herdû awa jî tên bikaranîn. Zimanzanan rastiya yekê jî piştrast nekirine.

**Dengên “b - v”**

Herçiqas me diyarkiribû ku bi hev guherîna van herdû dengan bingehê xwe ji dîrokê digire jî, ev bi hev guherîn di nava zaravê Kurmancî de hêj hebûna xwe diparêzin.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| Bav | Bab |
| Neqeb | Neqev |
| Derbas | Dervas |

**Dengên “j - z”**

Ev bi hevguherîn jî, bingehê xwe ji pêşketina dîrokî digire. Di nava zaravê Kurmancî de hêj hebûna xwe diparêze.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Jîrek** | **Zîrek** |
| **Jehr** | **Zehr** |
| **Jeng** | **Zeng** |

**Dengên “n - l”**

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Nivîn** | **Livîn** |
| **Nimêj** | **Limêj** |
| **Ling** | **Ning** |

**Dengên “r - l”**

Ev herdû deng, cihê derketina wan nêzikî hevin, ji ber wê çendê cihê xwe zu bihevdu diguherin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Alîkar** | **Arîkar** |
| **Lawir** | **Rawir** |

**Dengên “s - z”**

Ev herdu deng nêzikî hevin. Lewra ji hev bandor dibin. Di hinek karan de, dengê “**s**” ya di jêderê de, di koka demê niha de dibe “**z**”.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Parastin** | **Diparêzim** |
| **Xwestin** | **Dixwazim** |
| **Gestin** | **Digezim** |
| **Bihîstin** | **Dibihîzim** |

**Dengên “q - k”**

Ev herdu deng nêzikî hevin. Di karanîna peyvê de, dema cihê xwe bi hevdû diguherin, carna wateyên cuda û peyvên cuda derdikevin holê.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Qelandin** | **Kelandin** |
| **Qelaştin** | **Kelaştin** |

**Dengên “f - v”**

Ev herdu deng jî nêzikî hevin. Bandorê li hev dikin û carna cihê xwe bi hev diguherin.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Tifing** | **Tiving** |
| **Dehfdan** | **Devdan** |
| **Mirov** | **Mirof** |
| **Dikevim** | **Dikefim** |
| **Daxivim** | **Daxifim** |
| **Dipeyîvim** | **Peyîftim** |

**Dengên "h - x"**

Dengê "**h - x**" car car cihê xwe bi hevdû diguherin û mînakên wan jî kêmin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Hîm** | **Xîm** |
| **Hine** | **Xine** |

**Dengên "s - ş"**

Ev herdu deng jî gelek ji hevdû bandor dibin û cihê xwe bihevdu diguherin.

**Mînak:**

| Rast | Şaş |
|---|---|
| **Şkestin** | **Şkeştin** |
| **Pisîk** | **Pişîk** |
| **Şoravk** | **Soravk** |

**Dengên "d - t"**

Cihê jê derketina van dengan jî yeke. Lewra bandoriyê li hev dikin û cihê xwe bi hevdû diguherin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Dihînim** | **Tînim** |
| **Dihêm** | **Têm** |

**Dengên “t - ç”**

Mixabin di zimanê nivîskî de, ev herdu awa derdikevin pêşberî mirov. Dibe ku bi berdewamkirina demê re yek jî van ji holê rabe.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Ti** | **Çi** |
| **Tîk** | **Çîk** |
| **Têjik** | **Çêjik** |

**Dengên “z - d”**

Guherîna di van herdu dengan de, ji ber dû sedeman tê. Sedemek her weke me berê jî gotibû, cudatiya ji kurahiya dîrokê tê. Sedemê din jî, ji bandora zimanê Farisî tê.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Zerya** | **Derya** |
| **Zava** | **Damat** |

**Têbinî: 1**

Hin peyv hene ku ji zimanên din derbasî zimanê Kurdî bûne, zimanê Kurdî ji van peyvan hinek li zimanê xwe anîne, hinek jî weke xwe mane. Heta li hin cihan hatine guhertin, li hin cihan jî weke xwe mane. Ev yek di warê rastnivîsîna Kurdî de buye sedema tevilheviyê

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Silav** | **Selam** |
| **Qure** | **Kure** |
| **Enqere** | **Ankara** |

**Têbinî: 2**

Dema di peyvekê de, dengê “ ض” ya Erebî hebe û derbasî zimanê Kurdî bibe, carna weke “**z**” ya Erebî, carna jî weke “**d**” tê xwendin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **Qazî** | **Qadî** |
| **Qeza** | **Qeda** |

## PÊKANÎN

**1- Di Kurmancî de daqurtandina denga bi mînakan vekîn.**
**2- Cihguherîna dengê “s” bi “ş” bi mînakan vekin.**
**3- Cihguherîna dengê “v” bi “w” bi mînakan vekin.**
**4- Di navbera zaraveyên Kurmancî û Dumilkî de, guherîna dengê “v” bi “m” û “j” bi “z” bi mînakan vekin.**
**5- Di Kurmancî de guherîna dengê “n” bi “l” bi mînakan vekin.**
**6- Di derbasbûna hinek peyvan ji Erebî bo Kurdî de, guherîna dengê “d” bi “z” yê bi mînakan vekin.**

## PÊŞBAZÎ

1- Peyvên li jêr yên rast bi “**R**” yên çewt jî bi “**Ç**” yê nîşa bikin.

| Peyv | Rast | Çewt |
|---|---|---|
| **Selam** | | |
| **Qure** | | |
| **Şkestin** | | |
| **Pişîk** | | |
| **Mirof** | | |
| **Tifing** | | |
| **Peyîfîn** | | |
| **Hefdeh** | | |
| **Nivîs** | | |
| **Awa** | | |
| **Weke** | | |
| **Govend** | | |

## XEBATÊN AMADEKARÎ

**1- Gelo guherîn û veguherîna dengan bandorê li ser rastnivîsînê dike?**
**2- Çima hinek peyv çewt tên karanîn?**

## GUHERÎN Û VEGUHERÎNA DENGDÊRAN

Di zaravê Kurmancî de, li hev guherîna dengdêran ji hev guherîna dengdaran zêdetire. Ev jî bandoriyekê nerênî li ser rast nivîsîna zaravê Kurmancî dike. Ji ber ku peyvek bi gelek awayên ji hev cuda derdikevin pêşberî mirov.

**Dengên "u - i"**

Ev herdu deng gelek zu bi hevdu tên guhertin. Bitaybet dengê "u" bi hêsanî dikare cihê xwe ji dengê "i" re bihêle. Heta mirov dikare bêje ku gelek peyvên ku di wan de dengê "i" heye, berê de dengê "u" hebû. Dema mirov bala xwe dide hinek peyvên devokî, mirov vê yekê dibîne. Di zaravê Kurmancî de, dengê "u" berbi dengê "i" ve hatiye herikandin.

**Mînak:**

| | |
|---|---|
| **du** | **di** |
| **tu** | **ti** |
| **pur** | **pir** |

**Dengên "e - ê"**

Ev herdû deng, ji ber ku nêzî hevin gelek caran cihê xwe bi hevdû diguherin.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Yek** | **Yêk** |
| **Mejî** | **Mêjî** |
| **Hejmar** | **Hêjmar** |

**Têbinî:**

Herwiha ji ber ku di zimanê Tirkî de "**ê**" nîne, gelek peyvên Kurdî yên ku di wan de dengê **"ê"** heye, weke Tirkî bi "**e**" yê hatine nivîsandin û xwendin. Ev curek yê bişaftinê ye, divê mirov li hemberî vê yekê şiyarbe.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Têkoşîn** | **Tekoşîn** |
| **Bêrîvan** | **Berîvan** |
| **Tîrêj** | **Tîrej** |

**Dengên "e - i"**
Ev herdû deng jî di gelek peyvan de cihê xwe bi hevdu diguherin.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Mirov** | **Merov** |
| **Wiha** | **Weha** |
| **Wisa** | **Wesa** |
| **Winda** | **Wenda** |
| **Tijî** | **Tejî** |
| **Çil** | **Çel** |
| **Xirab** | **Xerab** |

**Pirsgirêka "u" "û" yê**
Pirsgirêkekê din a rastnivîsînê jî, peyvên ku bi dengdêrên "u – û" tên nivîsandin derdikevin pêşiya mirov. Celadet Bedirxan daye zanîn ku dengê "u" ji dengê "wi" yê pêkhatiye. Li herêma ku dengê "u" yê weke "ü" ya Tirkî tê xwendin, li şûna wî dengî "wî" yê bikar tînin. Heke em vê yekê di zimanê nivîskî de bipejirînin, divê em li gel duçengê (xw) dabaşa duçenga "kw", "gw" û "şw" yê jî bikîn. Lê belê di zaravê Kurmancî de, ji bilî "xw" ti duçengên din nehatine destnîşan kirin. Ji ber vê yekê divê peyvên bi duçenga "xw" yê bi duçengê bêne nivîsandin.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Xwîn** | **Xûn** |
| **Xwîşk** | **Xuşk** |
| **Xwê** | **Xû** |
| **Xwe** | **Xu** |
| **Xweh** | **Xuh** |

Di vê dengê **"û"** yê jî di rast nivîsandinê de, bi awayekê rast bê nivîsandin.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Gûz** | **Gwîz** |
| **Bûk** | **Bwîk** |
| **Kûr** | **Kwîr** |
| **Şûr** | **Şwîr** |
| **Şûn** | **Şwîn** |

Herwiha ji ber heman sedemê hin kes peyvên ku têde “**u**” hebe, bi duçengê dinivîsin û ev jî bi xwe re çewtiyekê ya rast nivîsînê peyda dike.

**Mînak:**

| Rast | Çewt |
|---|---|
| **Xurt** | **Xwirt** |
| **Xuya** | **Xwiya** |
| **Kurt** | **kwirt** |

## Bi Hevguhertina Dengdêrên Kurt û Dirêj

Dema dengdara “**h**” li pîşt dengdêrên kurt (**i - e - u**) tê karanîn, herdû cihê xwe ji dengdêrekê dirêj re dihêlin.

**Mînak:**

| Awayê Dirêj | Awayê Kurt |
|---|---|
| **Cih** | **Cî** |
| **Mih** | **Mî** |
| **Rih** | **Rî** |
| **Sih** | **Sî** |
| **Duh** | **Do** |
| **Tirih** | **Tirî** |
| **Buhtan** | **Botan** |
| **Teht** | **Tat** |
| **Suhtin** | **Sotin** |
| **Pehtin** | **Patin** |

Li gorî vê pêşdariya jorî, di zaravê Kurmancî de herikînek bi vî awayî heye. Lê belê hin kes vê zagona dengan binpê dikin, ev jî bi xwe re çewtiyek ya rast nivîsînê pêktîne. Ew jî li ber dengdêrên dirêj, dengdara **“h”** yê dinivîsin.

**Mînak:**

| Awayê Rast | Awayê Çewt |
|---|---|
| **Cih** | **Cîh** |
| **Mih** | **Mîh** |
| **Rih** | **Rîh** |
| **Sih** | **Sîh** |
| **Duh** | **Doh** |

## PÊKANÎN

**1- Guherîna dengê “u” bi “i” yê bi mînakan vekin.**
**2- Guherîna dengê “e” bi “i” yê bi mînakan vekin.**
**3- Guherîna dengê “e” bi “ê” yê bi mînakan vekin.**
**4- Di karanîna duçengan de, çewt nivîsîna hinek peyvan bibînin.**
**5- Awayê dirê û kurt yê ku dema li pêşiya dengdara “h” dengdêrên “i, e, u” tên karanîn, bi mînakan vekin.**

## PÊŞBAZÎ

1- Peyvên li jêr yên rast bi “**R**” yên çewt jî bi **“Ç**” yê nîşa bikin.

| Peyv | Rast | Çewt |
|---|---|---|
| **Mih** | | |
| **Cîh** | | |
| **Xurt** | | |
| **Şûr** | | |
| **Kwîr** | | |
| **Gûz** | | |
| **Gwîz** | | |
| **Xwîn** | | |
| **Xû** | | |
| **Xweh** | | |
| **Xuşk** | | |
| **Tejî** | | |
| **Wiha** | | |
| **Wesa** | | |
| **Winda** | | |
| **Têkoşîn** | | |
| **Tîrêj** | | |
| **Tekoşîn** | | |
| **Tîrej** | | |
| **Mejî** | | |
| **Hêjmar** | | |
| **Yêk** | | |




**1- Li gorî Kurdiya kevin peyva "avêtin" çawa tê nivîsîn?**
a- Avêştin
b- Hawêştin
c- Hawêjtin
d- Havêtin
e- Havêşt
**2- Ji peyvên li jêr kîjan di aliyê wateyê de nêzikî peyva "biav"e?**
a- Avdêre
b- Avgire
c- Aviye
d- Avzêye
e- Avzêre
**3- Dengdêra "u" piranî dikeve piştî kîjan dengdara jêrî?**
a- b
b- c
c- l
d- f
e- g
**4- Kîjan tîpên dengdêr li pêşiya tipa dengdara "y" nayên bikaranîn?**
a- a, ê
b- ê, î
c- o, u
d- û, u
e- ê, i
**5- Dengdêra "û" li pêşiya kîjan dengdarê nayê bikaranîn?**
a- k
b- q
c- w
d- z
e- ş

**6- Di kîjan peyên jêr de tîpa dengdar ketiye?**
a- Şerker
b- Karker
c- Rastir
d- Baştir
e- Hişktir
**7- Di xwendina kîjan peyva jêrî de dengdara "s" bi "z" hatiye guhertin?**
a- Saz
b- Qaz
c- Derbaz
d- Gurz
e- Berz
**8- Di kîjan peyvên jêr de dengdara "v" bi "w" hatiye guhertin?**
a- Hew
b- Kew
c- Cew
d- Dew
e- Şew
**9- Di kîjan peyvên jêr de dengê "v" bi "m" hatiye guhertin?**
a-Nam
b-Dêm
c- Bêrm
d- Kurm
e- Dem
**10- Di kîjan peyvên jêr de dengê "j" bi "z" hatiye guhertin?**
a- Roz
b- Doz
c- Poz
d- Koz
e- Soz
**11- Li gorî zaraveyê Kurmancî kîjan peyva jêr şaş hatiye nivîsandin?**
a- Karmend
b- Gowend
c- Avakir
d- Sazûmankir
e- Dewlemend
**12- Di kîjan peyva jêrî de dengê "b" bi "p" hatiye guhertin û peyv çewt buye?**
a- Pê re
b- Pîvaz
c- Pêlav
d- Pê ve

e- Piçûk

**13- Kîjan peyva li jêr şaş hatiye nivîsîn?**

a- Neqev
b- Qevd
c- Sêkuç
d- Heban
e- Meşk

**14- Di kîjan peyva jêr de dengdara “l” bi “n” hatiye guhertin?**

a- Nal
b- Nan
c- Ning
d- Nevî
e- Nêvişk

**15- Di herikîna kîjan peyva jêrî de, dengê “s” bi “z” yê hatiye guhertin?**

a- Dibezim
b- Sazdikim
c- Bazdidim
d- Dixwazim
e- Radizim

**16- Ji peyvên jêr kîjan rast hatiye nivîsîn?**

a- Mirof
b- Tiving
c- Dikefim
d- Daxifim
e- Şkestin

# BEŞA III

## PEYV

Ji dengek yan ji kombûna çend dengên wate, yan erkê wan heyîn re peyv tê gotin. Peyv yekîneyên ziman yên wate yan erkê wan heyîne. Piraniya peyvan xwedî watene, ji derve ve heyînekê, tiştekê yan tevgerekê didin nasîn. Demê em peyvê dixwînin, ew heyîn yan tevger li ber çavên me zindî dibin. Weke; Pirtûk, lênûs, pez, rastkêş, sîkutik, firîn, axivîn...

Lê belê peyvên wateyekê himbêz nakin jî hene. Weke; di, bi, li, lê, û, ger, yan, jî... Wateya van peyvan nîne û heyînekê yan tevgerekê nadin nasandin. Di hevokê de, bi peyvên watedar re tên bikaranîn û li ser wateya wan, wateyek nû zêde dikin. Weke; Min di mal de, Ger Egîd, Yan were yan jî neyê, Min û wê, Ew jî, Hem diwxîne hem dixebite...

Li gor yekîneyên biçûk yên weke; deng, kite û pêvek bi serê xwe wateyê nadin. Lê peyv bi serê xwe wateyê didin.

Me gotibû peyv di aliyê çêbûnê de, ji dengek yankombûna gelek dengan pêktê. Di zimanê me de, çend peyvên ji dengekê pêktên hene. Weke; "ê, e, û, a"

**Mînak:**

**Ê**: Di bersiva dikarî bixwînî de, mirov dikare bêje: "**Ê**"
**E**: Dîsa dema mirov bêje: "Te name nivîsandiye?" Ger bersiv erênîbe, dikarî bêjî: "**E**"
**A**: Weke cînav tê bikaranîn. Mînak: "**A**" min.

## WATENASÎ

Lêkolîna di warê wateyê de, di nava xebatên zimanzaniyê de, karekê taybete. Ji vî karî re watenasî tê gotin. Zimanêzanên ku li ser vî karê zimanzaniyên radiwestin, ji aliyê wateyê ve peyvan, birepeyvan û hevokan lêkolîn dikin. Her peyv xwediyê wateyekê ye û peyamekê ji mirov re radigihîne. Dîsa mirov dikare bêje; her peyv xwediyê têgihandinekê ye. Watenasî nîşandide ku xwe têgihandina peyvekê çiqas xurte û ji aliyê wateyê ve çiqas kûr û berfirehe.

Watenasî, li ser wateya têgeha peyvê radiweste. Ew wate bi demê re pêkhatiye û wateya bingehîne.

**Mînak:**Dema em dibêjin; "**gul**", kulîlkeke rengîn, bi gelemperî rengê wê sor û bibêhn tê bîra mirov. Wateya wê ya sereke eve. Ji ber reng û bêhna xwe, "**gul**" di hinek wateyên xazeyî de jî hatiye bikaranîn.

**Mînak:** Gelek helbestvan ji bo evîndara xwe, peyva "**gul**" bikaranîne.

Wateya bingehîn ya peyvan, li gorî karhêneran naguhere. Piraniya karhêneran li ser wê wateyê li hev dikin. Lê wateya ku li gorî karhêneran biguhere, dikeve warek din û li gor pêwîstiyê guherînê pêktîne.

Wateya bingehîn, ji bo bikaranîna rast a peyvê dibe alîkar. Hin caran peyvek ji aliyê hevoksaziyê ve cihê xwe digire, lê belê ji aliyê wateyê ve cihê xwe nagire. Ji ber vê yekê, dema em peyvê di hevokê de bikartînin, pêwîste em bi qasî sazûmaniya peyvê, sazûmaniya wateyê jî berçav bigirin.

**Mînak:** Dema yek bêje; "**Lênûsê darek çand**." Ji aliyê peyvsazî û hevoksaziyê ve neçewte. Lê ji aliyê wateyê ve hevok wisa nayê pejirandin. Lewra "**lênûs**" ne tiştekê zindiye û nikare daran biçîne. Lê ger mirov wateya wê ya xaze bikarbîne, mirov dikare bêje; "**Vê lênûsê serê te xwar**." Dema ku mirov peyvan li gorî wateya bingehîn û taybetmendiyên heyberên ku nîşan dide dabeş bike, wê demê rê li ber bikaranînên ne li cih digire.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Ma gelo sazkirina hevokekê kiryarî bêy kar pêkane?
2- Ma em dikarin ji tevayî karan re peyvên kok bikar bînin?
3- Hûn dikarin kokên kar û nav ji hev dû cûda bikin?

## PEYV Û CÛRÊN WAN

### PEYV LI GORÎ WATE YAN ERKÊ XWE

**Peyv li gorî wate yan erkê xwe dibin sê beş:**

- Kar
- Nav
- Alav

## 1-PEYVA KAR

Kar, kirina karê kirekê dide têgihandin, herwiha li gor dem û kesan pêvekan digire û li gorî pêwîstiyê tê kêşan. Kar, di hevokê de bi dû awayan tê karanîn. Kara weke kok (çû, bir, xwar, hat...), kara weke gewde (vexwar, vehûnad, vemalişt, daket, daqurtand...) tê bikaranîn.

Bê gûman her karek koka wê heye. Dema li ser wê kokê pêvekên sazker tê zêdekirin, wê demê derbazî rewşa xwe ya gewdeyê dibe.

## A- KOK

Kok, parçeyek watedar ya peyvê ye.

**Mînak:** Di peyva çûbûn de "**çû**" koke. Di vê derê de, ji vê peyvê em wateya "**çuyînê**" têdigihîn.

Kok, parçeya peyvê ya nayê parçekirine.

**Mînak:**"**Mir**" Ev kok bi ti awayî nayê parçekirin.

Kok, peyva xwerû ya ku heyînekê bi me dide naskirin yan kirina karekê bi me dide zanîne. Pêveka sazker nagirin, dema bigirin jî rewşa xwe ya kokê ji dest didin.

Kok, tovika peyvêye.

**Mînak:** "**vexwar**" koka wê "**xwar**" e. Dema em bixwazin wateyek din lê bar bikin, li ser vê kokê pêveka sazker tê zêdekirin.


**Mînak:** ve (pêvek) + xwar (kok) + bû (pêveka demî) + n (pêveka kesî) = vexwaribûn

Ji bo her heyîn yan karekî, kokek cuda nîne. Belkî ji bo binavkirin yan jî naskirina kar, neçar dibin li ser kokekê nêzikî wê pêvekekê zêde bikin. Bi vî awayî divê ji bo pênaseya her heyînekê û naskirina her karekî jî peyvekê sazbikin.

**Mînak:** Ji bo karê "**bêrîvanî**" peyvekê kok ya wê wateyê bide nîne. Ji ber wê em neçar dibin, di aliyê wateyê de li ser koka herî nêzikî wê, pêvekekê zêde bikin û ji bo nasandina wî karî peyvekê nû sazbikin.

Çareserkirina gewdeya "**Bêrîvan**"


**Mînak:**




**Mînak:**Ji bo jêdera "**hilweşandin**" peyvekê xwerû ya weke kok nîne. Ji bo em peyvekê wî karî bide diyarkirin peyda bikin, divê li ser koka di aliyê wateyê de herî nêzikî wê, pêvekekê zêde bikin.

Çareserkirina gewdeya “**Hilweşand**”

## Mînak:




Di ziman de sê cûrên kokan hene. Koka nav, koka kar û koka hevdeng. Ji ber ku di cîhanê de em dikarin dabaşa dû tiştan bikin, ev jî; çalakî yan danasîna heyînekê ye. Herwiha hinek peyv ji wan hem çalakî hem jî heyînekê bi me didin zanîn.

**Koka Nav**: mirov, heval, das, hest, hiş...
**Koka Kar:** hat, çû, bir, xwar, kir...
**Koka Hevdeng**: xwar, bir, kir...



## PÊKANÎN

**1- Hevokekê sazbike, bila karek ji kokê çêbuyî têde hebe û wê hevokê careser bike.**
**2- Kokên “bir, hat, kirî” ji kîjan jêderan çêdibin? Lêkokîn bikin.**
**3- Ji peyvên “daweşandin, dada, hiltavêt, wê bavêje, dadixistin” kok peyda bikin.**
**4- Ji bo kokên “nav, kar û hevdeng” her yekê sê mînak binivîsin.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Dema em dibêjin gewde, em çi têdigihîn? Ma gelo ji peyvekê xwerû gewde çêdibin?

2- Ji bo ku em ji bo her tişt û tevgeran navekê peyda bikin, pêwîstiya me bi çi heye?

3- Li gorî we gewde çawa tê sazkirin?

## B- GEWDE

Gewde, ji kok û pêveka sazker çêdibe. Dema em li ser koka peyvekê pêvekekê zêde bikin, em ji wê re dibêjin gewde.

**Mînak:**hilketim, hilketibûm, bêrîvan, ciwantî...

Gewde di nava xwe de dibin dû beş:

### 1- GEWDEYA KAR

Ew gewdeyên ji koka kar çêdibin û kirina karekê didin diyar kirin,jê re gewdeya kar tê gotin.


#### a- Gewdeya Kar ya Ji Koka Kar Çêdibe

Li ser koka kar pêvek tên zêdekirin û kirina karekê bi me dide nasîn.
Ji jêdera "**ketin**"
Dibe ku li ser gewdeyekê pêvekên cûr be cûr bên zêdekirin.

***Pêveka kesî:***

**Mînak:**

Çareserkirina gewdeya "**Hilketim**"




***Pêveka kesî:***

**Demê bê:**

**Mînak:**


Çarserkirina gewdeya “**Dê hilbikevim**”




**Demê niha:**

**Mînak:**


Çareserkirina gewdeya “**Hildikevim**”




**Demê bûrî:**


**Mînak:**

Çareserkirina gewdeya “**Hilketin**”




**Mînak:**


Çareserkirina gewdeya “**Hildiket**”




Çareserkirina gewdeya “**hilketiye**”




Çareserkirina gewdeya “**Hilketibû**”




### b- Gewdeya Kar Ya Ji Koka Nav Çêbuyî

Li ser koka nav pêvek tên zêdekirin û kirina karekê bi me dide nasîn.
Ji jêdera “**revîn**”

**Demê bê**


**Mînak:**

Çareserkirina gewdeya “**dê birevim**”





**Demê niha**

Çareserkirina gewdeya “**direvim**”





**Demên bûrî**


Çareserkirina gewdeya “**direvîm**”



Çareserkirina gewdeya “**Revîme**”




Çareserkirina gewdeya “**Revîbûm**”






**PÊKANÎN**

**1- Hevokekê gewdeya kar ya ku koka wê nav têde heyî, saz bike û wê hevokê çareser bike.**
**2- Ji koka “çû” bi alîkariya pêvekên kesî û demî, gewdeyekê karî çêbikin.**
**3- Jêdera “ketin” li gorî deman biherikîne û çareser bike.**
**4- Kokên van gewdeyên karî “radiwesta, dadiweşand, hilnediket” bibîne.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Li gorî we cûdahiya di navbera gewdeya nav û gewdeya kar de çiye û çima dibêjin gewdeya nav?

2- Gelo ma gewdeya nav tenê ji kok û pêvekên sazker çêdibin?

3- Ma hûn dikarin ciyewaziyekê berbiçav di nava gewdeyên nav yên ji kok nav û ji koka karan çêdibin de, bibînin?

## 2- GEWDEYA NAV

Ew gewdeyên ji koka nav çêdibin û heyînekê didin diyar kirin,jê re gewdeya nav tê gotin.


### a- Gewdeya Nav ya Ji Koka Nav Çêdibe

Li ser koka nav pêvek tên zêdekirin û heyînekî bi me didin nasîn.

**Mînak:**


Çareserkirina gewdeya “**Bêrîvan**”

Bêrîvan




Çareserkirina gewdeya “**Berçavikvan**”

Berçavikvan




### b- Gewdeya Nav ya Ji Koka Kar Çêdibe


Li ser koka kar pêvek tên zêdekirin û heyînekê bi me didin nasîn.

**Mînak:**

Çareserkirina gewdeya “**çavdêrî**”




Çareserkirina gewdeya “**ketî**”






**PÊKANÎN**

**1- Gewdeyên li jêr hatine nivîsîn, kîjan gewdeya kar kîjan ya nave? Ji hev cuda bike.**

**“çuyîn, bezîn, hildan, birîn, kirîn, revîn, bêrîvan, gundî, amedî, çolî, evîndar, şevîn”**

**2- Ji kokên “rev, çû, masî, ken, kew, nivîs” gewdeyên pêwîst sazbike.**

**3- Gewdeyên navî yên di hevokên jêrî de bibîne û çareser bike.**

**Darvanî bi darvanan re çû dar birînê.**

**Girtiyan girtîgeh hilweşandin.**

**4- Gewdeya “gavan” li gor deman bide herikandin.**

**5- Gewdeyek ya navî ya ku ji koka kar çêbuyî, sazbike.**

**6- Gewdeyek ya navî ya ku ji koka nav çêbuyî, sazbike.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ


1- Salox bi alîkariya kîjan pêvekan sazdibin?
2- Ma hûn cudabûna di navbera gewdeya buyî salox û yên navî de dikarin bibînin?
3- Ma peyvekê sade dikare bibe salox?

# SALOX


Dema ku li ser gewdeya nav pêvekên demî zêde dibin, ew gewde dibin salox.

**Demê Niha**


**Mînak:**
Çareserkirina gewdeya “**ketiye**”




**Demê Bûrî**
Çareserkirina gewdeya “**Şoreşgerbû**”



Çareserkirina gewdeya “**Dê xwendekarbe**”






## PÊKANÎN

**1- Ji heryek ji peyvên “reş, sor, ket, xwînsar” saloxekê sazbike, di nava hevok’ de bikarbîne û wê hevokê çareser bike.**
**2- Di aliyê wateyê de ciyewaziya di navbera kar û saloxê de lêkolîn bike û ji bo her yekê mînakekê sazbike.**
**3- Ji peyva “xweş” saloxên hemû deman sazbike û di nava hevokê de çareser bike.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Em daxwazên xwe bi çi awayî ji yên li hemberî xwe re raber dikin?
2- Dema em bixwazin ji kesekê ji xwe mezintir re fermanekê ragihînin, em kîjan raweyê bikartînin?
3- Li gorî we, di raweyan de pêkhatina kar kîjan demê çêbuye?


## DI RAWEYAN DE ÇARESERIYA GEWDEYAN

### Raweya Daxwazî


Raweya daxwazî, bi hevgirtina kara demê bûriyê nêzîk û bûriyê çêrokî li gel pêveka raweya daxwazî (**ba-a**) tê sazkirin.

**Mînak:**

Çareserkirina gewdeya **"Hatibûma"**



Çareserkirina gewdeya “**Hilweşandiban**”





### Raweya Fermanî

Pêkhatina kar bi awayek fermanî dide pêşwazî kirin. Pêveka raweya fermanî “**e-in**” nin.

**Mînak:**

Çareserkirina gewdeya “**bihejîne**”




**Tîbinî:**


Dema em bixwazin ji yekê ji xwe mezintir re fermanekê ragihînin, dikarin ji bo rêzdariyê li şûne “**bike**” peyva “**tû bikî başe...**” bikar bînin.

### Raweya Mercî

Raweya mercî, pi peyva “heke-eger-ger” û pêvekên “**ba-a**” tê sazkirin.

**Mînak:**

Çareserkirina gewdeya “**vexwariban**”






**PÊKANÎN**

**1- Cûdabûna di navbera raweya fermanî û mercî de lêkolîn bikin.**
**2- Ji jêdera “daqurtandin” raweya mercî, fermanî û daxwazî çêbike û çareser bike.**
**3- Ji koka “doht” raweya mercî, fermanî û daxwazî çêbike û çareser bike.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Ma wate li ser ciyewaziya jêdera têper û netêper bandor dike?
2- Ma em dikarin rewşa jêderan bi hinek pêvekan bidin guhertin?
3- Hûn dikarin hinek pêvekên jêderî yên jêderek netêper kirîn jêderek têper, bibînin?
4- Li gorî we çi ciyewazî di navbera jêdera resen û ya çêkirî de heye?

## JÊDERÊN KARÊN TÊPER Û NETÊPERAN

Di zaravê Kurmancî de piranî pêvekên jêdera karên têper û netêper, ji hev cuda dibin. Pêveka **"în"** jêdera kara netêper, pêveka **"andin"** jî jêdera kara têper dide çêkirin. Hinek karên weke; "**kirîn, birîn**" di aliyê nivîsînê de dimînin karên netêper. Ji ber ku bi dawiya wan ve pêveka "**în**" tê dîtin. Lê dema temaşeyî wateya wan dikin, dibînin ku têperin. Ji ber ku bi qasî peyvsaziyê, wate jî bandorekê mezin li ser têper û netêperbûnê dike.

**Mînak:**

| Kok | Jêdera karê netêper | Jêdar karê têper |
|---|---|---|
| Rev | Rev**în** | Rev**andin** |
| Fir | Fir**în** | Fir**andin** |
| Bez | Bez**în** | Bez**andin** |
| Êş | Êş**în** | Êş**andin** |
| Kel | Kel**în** | Kel**andin** |
| Cemed | Cemid**în** | Cemid**andin** |
| Ken | Ken**în** | Ken**andin** |
| Xap | Xap**în** | Xap**andin** |
| Ger | Ger**în** | Ger**andin** |
| Tep | Tepis**în** | Tepis**andin** |
| Kew | Kew**în** | kew**andin** |

**Mînak:**

**Ji bo karên têper**

Ji jêdera "**revandin**"

Karwankevokrevand.

*Kirek pêkir kara têper*

| Sosinê name bilez di refê de nivîsî. | | | |
|---|---|---|---|
| **Corê peyvê** | | **Birên peyvê** | **Erkên peyvê** |
| Sosin | nav | | Kirek |
| Ê | Zayenda mêza | | |
| Name | Nav | | Pêkir |
| Bilez | Hevalkara rewşî | | Têrker |
| Di | Daçek | Di refê de | Birên alavên daçekî |
| Refê | Nav | Di refê de | Têrkera cihî |
| De | Paşdaçek | | |
| Nivîsî | | | Kara **têper** |

**Mînak:**

**Ji bo karên netêper**

Ji jêdera "**Bezîn**"

| Ew li daristanê re xweş bezî. | | | |
|---|---|---|---|
| **Cûrê peyvê** | | **Birên peyvan** | **Erkên peyvê** |
| Ew | Cînav | | Kirek |
| Li | Daçek | Li daristanê re | Birên alavê daçekî |
| Daristan | Nav | | |
| Ê | Pêveka palvedanê | Li daristanê re | Têrkera cihî |
| Re | paşdaçek | | |
| Xweş | Hevalkara rewşî | | Têrker |
| Bezî | | | Kara **netêper** |

Peyvên ji koka **"germ, sar, kesk**"çêdibin, destpêkê li ser wan peyva "**kir**" tê zêdekirin, paşê pêveka "in" ya jêderî tê û jêder çêdibe.


**Mînak:**

Sor + kir = sorkir +in = sorkirin


Di van mînakan de, jêdera têper û netêper hemane. Dîsa di vê mijarê de aloziyek nû derdikeve holê û ji bo hevoka navdêrî û kiryariya nederbaz, heman hevok tê sazkirin. Ev herdu hevok li gorî wateyê ji hevdu cuda dibin.

**Mînak:**

**Hevoka saloxî**




**Hevoka kiryarî**




Divê neyê ji bîrkirin ku ev pêvek ne tenê ji jêderan ji nav, hevalnav û peyvên biyanî çêdibin. Belkî carna jêderên me yên resen jî dikevin bin vê bandorê û dibin jêderên darijtî.

**Mînak:**

| Jêdera resen | Jêdera netêper | Jêdera têper |
|---|---|---|
| Axaftin | Axivîn | Axivandin |
| Bişkaftin | Bişkivîn | Bişkivandin |
| Borandin | Borîn | Borandin |
| Guhertin | Guherîn | Guherandin |
| Hêrtin | Hêrîn | Hêrandin |
| Heraftin | Herifîn | Herifandin |

Li ser vê mijarê pêwîstî bi daxwiyaniyekê heye. Jêderên resen (kevin) hinek têperin hinek jî netêperin. Jêderên têper, bi alîkariya pêveka "**în**" dibin netêper, jêderên netêper jî bi alîkariya pêveka "**andin**" dibin têper.

**Mînak:**

Peyva "axaftin", jêdera karê netêpere. Bi pêveka "andin" buye "axivandin" û buye jêdera karê têper.

Ezaxivîm.

*Kirek   kara netêper*
Minewaxivand.
*Kirek pêkir  kara têper*

**Mînak:**

**Jêdera karê têper**
Ji jêdera "**guhertin**"

Wîcilê xweguhertin.
*Kirek pêkir kara têper*
Jêdera karê netêper
Ji jêder "guherîn"
Ezguherîm.
*Kirek    kara netêper*

Weke berê jî em li ser rawetiyabûn, ger pêkira kar hebe wê demê ew kar têpere, ger pêkira wê nebe ew kar netêpere. Di Kurmancî de têperî gelek girînge. Di Kurmancî de têper û netêper cuda tên kêşan. Karên têper, di demê bê û demê niha de hevsengiyê bi kirekê re çêdikin. Li gor kirek tê kêşan, di demê bûrî de kara têper hevsengiyê bi pêkirê re çêdike. Yanî li gor pêkirê tê kêşan. Ji ber vê yekê, di demê bê û yê niha de, kirek netewandî û pêkir tewandiye. Di demê bûrî de, kirek tawandî  û pêkir jî netewandiye.

**Mînak:**
**Ji bo demê niha**
Ji jêdera "**xwarin**"

Gulnashinar**ê**dixwe. / Gulnashinar**an**dixwe.
*Kirek   pêkir    kar        kirek    pêkir    kar*

**Ji bo demê bê**
Ji jêdera "**xwarin**"

Gulnaswêhinar**ê**bixwe. / Gulnaswêhinar**an**bixwe.
*Kirek  P.d. pêkirkar   kirek  p.d   pêkir    kar*

Dema em temaşeyî hevoka jor dikîn, dibînin ku hevsengiyek di navbera kar û kirekê de tê dîtin, herwiha dibînîn ku kirek nehatiye tewandin. Lê belê **"hinar**" li gor zayend û komê hatiye tewandin.

Divê rewşê de ger kirek kom jî be, wê neyê tewandin. Li gorî pêwîstiyê karê bê tewandin û wê tewandina wê bandorê li kirekê jî bike.

**Mînak:**

Xwendekarnemeyêdinivîs**e**. / Xwendekarnameyêdinivîs**in**.
*Kirek pêkir kar kirek pêkir kar*

Di demê bûrî de, hevsengî di navbera kar û pêkirê de çêdibe. Di vê rewşê de kirek tê tewandin, pêkir nayê tewandin.

**Mînak:**

**Ji bo demê bûrî**
Ji jêdera "**nivîsandin**"

Sorxwînênamenivîsî. / Sorxwînannamenivîsîn.
*Kirek pêkir karKirek pêkir kar*

## PÊKANÎN

**1- Ji jêdera resen ya "*hêrtin*" jêderek têper û ji jêdera resen ya "*axaftin*" jêdera netêper çêbike.**
**2- Karekê têper ji jêdera "daxistin" sazbike û vê karê li gor tevayî deman biherikîne.**
**3- Dema em kirekê ji cînavê tewandî li ser hevokekê netêper bikar bînin û dema kirekekê ji cînavê netewandî li ser hevokekê têper bînin, rewşên çawa derdikeve holê? Lêkolîn bike.**
**4- Gelo mirov dikare pêveka tewnadî bike kirekê kara "got"? Ger ne, çima? Lêkolîn bike.**

**Têbinî:**
Dema kirek nêrza û yekjimar be, dibe ku neyê tewandin.

**Mînak:**

Serdarnamenivîsî.
*Kirek pêkir kar*

Kara têper her tim dikeve dawiya hevokê.

**Mînak:**

Wêpirtûkxwend.
*Kirek pêkir kar*

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Cînavê tewandî û yê netewandî bandorek çawa li ser herikîna kar dikin?

2- Pêveka demê bê li gor nêrza û mêza tê guhertin? Ger bê guhertin, kengê û çawa?

3- Di demê bê di hevoka têper de, hevsengî di navbera kar û kîjan endamê de heye? Lêkolîn bikin.


4- Ger hevoka têper derbazî demê bê bibe, hevsengiya di navbera kar û endaman de wek ya demê bê ye yan na? Ger ne, çawaye?


# HEVSENGIYA DI NAVBERA KAR Û ENDAMÊN DIN YÊN HEVOKÊ DE

Kara netêper, her tim bi kirekê re di nava hevsengiyê de ye. Yanî dema kirek bê tewandin, di heman demê de kar jî tê tewandin û pêveka pêwîst digire.

## Mînak:

**Ji bo demê bê;**
Ji jêdera “**bezîn**”




Dema em temaşeyî pêveka demê bê ya di hevoka jor de hatî karanîn dikin, dibînin ku ev pêvek hem demê bê dide diyarkirin hem jî zayenda kirekê kifş dike. Herwiha pêveka kesî ya dikeve dawiya kara hevokê, di aliyê tewandinê de bandorê li ser kar û kirekê jî dike. Ji ber vê yekê dema kirek cînavê netewandî be, kar li gor kesan dikare bê tewandin. Lê, ger kirek cînavê tewandî be, kirek nikare li gor kesan bê tewandin.


## Mînak:

**Ji bo demê Niha**
Ji jêdera "**firîn**"





**Ji bo demê bûrî**
Ji jêdera "**kenîn**"


**Bûriyê xwerû:**




**Bûriyê çêrokî:**




**Bûriyê berdest:**




**Bûriyê dûdar:**




Weke ji mînakên jor jî tê têginandin, cînavên kesî yên netewandî dikarin di hemû deman de bibin kirekên hevokê. Herwiha di hevokên têper û netêper de jî dikarin heman erkî bigirin. Lê cînavên tewandî bes ji bo demê bûrî û weke kireka kara têper dikar bê bikaranîn. Dema ku ew weke kirek bêne bikaranîn, karên wan jî pêvekên kesî nagirin.


## Mînak

**Ji bo demê "bûrî"**
Ji jêdera "**xistin**"


**Bûriyê xwerû:**





**Bûriyê berdest:**



**Bûriyê çêrokî:**




**Bûriyê dûdar:**



## PÊKANÎN

**1- Hevsengiya di navbera endamên hevoka jêr de bibîne û endama ku tê tewandin nîşabike.**

**“Ez nameyê dixwînim.”**

**2- Hûn jî hevokekê hevsengî di navbera kar û pêkirê de heyî û kirek hatî tewandin sazbikin, çareser bikin.**

**3- Hevsengiya kar û endamên din bi çi çêdibin? Lêkolîn bikin û ji bo her yekê mînakekê sazbikin.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Kengê nepêwîste em kirek di hevokê de bikar bînin?
2- Dema kirek neyê bikaranîn, girîngiya ji kirekê re dihat dayîn, ji kîjan endama hevokê re tê dayîn? Bihizire.
3- Kara tebatî di encamê çi pêkanînê de derdikeve holê?


## KARÊN TEBATÎ Û LEBATÎ

### a- Kara Tebatî

Kara tebatî, di wan hevokên ku kireka wan nediyar û bêbandor de, bi alîkariya jêdera “**hatin**” tê sazkirin. Jêdera “**hatin**” li gor dem û kesan tê kişandin û kara bingehîn jî di rewşa jêder de dimîne û li dawiya hevokê tê bikaranîn. Di hevokên kara tebatî têde hatîn bikaranîn de, pêkir bandorkere û her tim li gel karên têper tên bikaranîn. Herwiha di zimanê rojane de pir kêm tê bikaranîn, piraniya xwe di xebatên rojnamegeriyê de tên karanîn.

**Mînak:**
Gund **hat** valekirin.
Kulek **hatin** şkandin.
Pirtûk **hat** xwendin.

Çareserkirina hevoka bi kara tebatî:




### b- Kara Lebatî

Ger kirekek diyar yekser pêkhatina kirinê bike, kara vê pêkhatinê lebatiye. Ji dervey kara têper ya bingehîn ya ku kara “**hat**” ya tebatî li ser zêde dibe, tevayî karên din lebatîne. Ji ber ku tevayî karên din kirekên wan diyarin.

**Mînak:**
Ez pirtûkê **dixwînim**.
Berfîn **diçe** zaningehê.

## PÊKANÎN

1- Ji jêdera "xwarin" karekê tebatî sazbike, wê karê di nava hevokê de bikarbîne û hevokê çareser bike.
2- Cudahiya di navbera kara tebatî û lebatî de lêkolîn bike û ji bo her yekê mînakekê sazbike.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Nav di hevokê de nabe kîjan endama hevokê, çima?
2- Nav dikare bibe kîjan endamê hevokê, çima?

## 2- PEYVA NAV

Peyva navdêr, di karanîna hevokê de li gor şêweyê karanîna xwe dibe çar beş: "**Nav, Cînav, Hevalnav, Hevalkar**"

## A- NAV

Peyva nav heyînekê dide nasandin.

**Mînak:** av, dar, dibistan, kewê...


### Bandora Peyva Nav Di Karanîna Hevokê de

Nav di karanîna hevokê de, her çiqas ne weke navekê jî derbazî hevokê bibe, lê di nava hevokê de bandoriyek bingehîn çêdike. Ji bilî endama hevokê ya bingehîn ya bi navê "**kar**", tevayî endamên din yên hevokê ji beşê navan çêdibin. Nav wekû erk, têkiliya hizrê mirov li gel darezandin, buyer û pêkhatina karê çêdikin. Endamên ku hevokê di aliyê wateyê de dewlemend û zelal dikin jî, ji beşê navan çêdibin. Herwiha nav di karanîna hevokê de gelek erkan distînin.

### Dema Nav Dibe Kirek

Peyva nav, dema di karanîna hevokê de, karê pêkhatina hevokê rêve bibe, dibe kirek.


**Mînak:**



### Dema Nav Dibe Pêkir

Dema nav di karanîna hevokê de kirina kar li ser hat rêvebirin, dibe pêkir.


**Mînak:**




### Dema Nav Dibe Têrker

Ew navên cihî yên ku di karanîna hevokê de tên bikaranîn, dibin têrker.


**Mînak:**




### Dema Nav Dibe Destpêk

Dema nav di karanîna hevokên navdêrî de, li destpêka saloxê tên karanîn, dibin destpêk.


**Mînak:**



### Dema Nav Dibe Salox

Dema nav di karanîna hevokên navdêrî de pêveka saloxê distîne û rewşê weke nûçeyekê radigihîne, dibe salox.

**Mînak:**




## PÊKANÎN

**1- Hevokekê sazbike bila kirekê wê nav be û pêkira wê jî cînav be. Vê hevokê çareser bike.**
**2- Endamên hevoka li jêr bide diyarkirin.**
**"Delîlê Xarpêtî vê pirtûka xweş dixwîne.**
**3- Hevoka li jêr çareser bike.**
**"Hinek bajarên parçeya Bakûrê Kurdistanê pir mezinin."**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Hûn dizanin nav li gor taybetmendiya heyînan dibin çend beş?
2- Hûn dikarin ciyewaziya di navbera navên li gorî wateya xwe û li gorî çêbûnê de çêdibin, bibînin?

## DI KARANÎNA HEVOKÊ DE ÇARESERKIRINA NAVAN

Me nav di salên derbazbuyî de di pênc beşên bingehîn de dabeş kiribû. Nav herçiqas di karanîna hevokê de, bi erkên cûda cûda tên karanîn jî, lê di bingehê xwe de nave.

Peyva “**Cegerxwîn**” di hevoka jêr de her çiqas kirek jî be, lê di bingehê xwe de naveke.

**Mînak:**

**Cegerxwîn**di baxçe de gul çand.

***Cegerxwîn***

1- Li gor taybetmendiya heyînan, taybete.
2- Li gor wateya xwe, şênbere.
3- Li gor jimarê, yekjimare.
4- Li gor zayendê, nêrzaye.
5- Li gor çêbûnê, hevgirtiye.
6- Li gor erk, kireke.

**Mînak:**

Hozan ji **şivaniyê** tê.

***Şivanî***

1- Li gor taybetmendiya heyînan, giştiye.
2- Li gor wateya xwe, şênbere.
3- Li gor jimarê, yekjimare.
4- Li gor zayendê, nêrzaye.
5- Li gor çêbûnê, turedaye.(dariştiye)
6- Li gor erk, pêkire.

## PÊKANÎN

**1- Cûrên navan lêkolîn bike û ji bo her cûrekê mînakekê sazbike.**
**2- Navên di hevoka jêr de bibîne û yek yek çareser bike.**
**“Wî Sosina çiya kirî, anî mal.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Li gorî we çima em dibêjin cînav? Bihizirin.
2- Hûn çi ciyewaziyê di navbera cînavê kesî û yê nîşandanê de dibînin? Mirov dikare bêje wekhevin?
3- Çi ciyewazî di navbera cînavên resen û yên li hev xistî de heye? Veke.

## B-CÎNAV

Peyv yan pêvekên cihê nav digirin û li şûna nav têne bikaranînin. Dîsa cînav, ew peyvên ne navin lê cîhê nav girtîne.

Di Kurmancî de cînav di navbera xwe de dibin heşt (8) beş:

### 1- Cînavên Kesî

Peyva ne nav û li cihê navê kesî tê bikaranîne.

**Mînak:**

**Sorxwînê** name nivîsî.
*Navê kesî*
**Wê** name nivîsî.
*Cînaê kesî*

**Cînavên kesî di navbera xwe de dibin dû beş:**

Cînavên kesiyên tewandî: min, te, wî/wê, me, we, wan
Cînavên kesiyên netewandî: ez, tû, ew, em, hûn, ew

### 2- Cînavên Nîşandanê

Peyva ne nav û ji bo nîşandana kesekê yan tiştekê li cihê nav tê bikaranîne.

**Mînak:**

**Pirtûkê** bîne dibistanê.
*nav*
**Vê**bîne dibistanê.
*Cinavê nîşandanê*

Weke ji salên bûrî jî tê zanîn, weke cînavê kesî, cînavên nîşandanê jî yên tewandî (vî, vê,wî, wê, van, wan) û netewandî (ev, ew) hene. Di aliyê bandorbûn û bandorkirina wan ya di hevokê de, mîna hevin. Heya hin endamên wan yên ku weke hev (ew, wî, wê, wan) tên nivîsandin jî hene. Ev cînavên hevpar li gor wate û bikaranîna xwe ji hev cuda dibin.

**Mînak:**

Cînavên kesî: **Ew** (Karker) hat dibistanê. / **Wê** (gulê) name nivîsî. / **Wî** (Şervan) kar kir.
Cînavê nîşandanê: **Ew** (Karker) hevalê mine. / **Wê** (pirtûkê) bide min. / **Wî** (derî) ji min re bîne.

### 3- Cînavên Pirsyarî:

Ev cînav, ji peyvên pirsyarî pêktên. Dema peyvên pirsyarî li şûna nav têne bikaranîn, dibin cînavên pirsyarî.

**Mînak:**

**Kî** hat dibistanê?
*Cînavê pirsyarî*
**Kawa** hat dibistanê.

### 4- Cînavên Nediyar:

Ev cînav ji peyvên nediyar pêktên. Dema peyvên nediyar li cihê nav tên bikaranîn, dibin cînavên nediyar.

**Mînak:**

**Hinek** nehatibûn.
*Cinavê nediyar*
**Çendekan** karê mal çênekiribûn.
*Cînavê nediyar*
**Zêde** hatibûn.
*Cînavê nediyar*

### 5- Cînavên Jimarî:

Her jimara bikeve cihê nav, dibe cînavê jimarî.

**Mînak:**

**Sê** çûn şer. (Egîd, Delîl û Şerzan çûn şer.)
**Ji çaran yek** bê ave.

### 6- Cînavên Vegerok:

Ev cînav bes, ji peyva “**xwe**” çêdibe. Dema peyva “**xwe**” yan “**xwe xwe**” li cihê nav tê bikaranîn, dibe cînavê vegerok.

**Mînak:**

**Bixwe** çû dibistanê.
*Cînavê vegerok*
**Xwe xwe** çû dibistanê.
*Cînavê vegerok*

## 7- Cînavê Li Hev Xistî

Ev cînav ji daçek û cînavê kesî çêdibin. Dema em dengdêra "**i**" ya li ser daçekê radikin û dengdara "**w**" ye li ser cînavê kesî tavêjin, wê demê cînavê li hev xistî derdikeve holê. Li şûna em bêjin "**ji wê**", em dibêjin "**jê**". Ev cînav di aliyê wateyê de cihê daçek û cînavê kesî bi hev re digire.

**Ev cînav weke daçekan dibin çar beş:**

Cînavê Li Hev Xistî ya Bi "**bi**"

**Mînak:**

Ez **bi wê** re çûm geştê. / Ez **pê** re çûm geştê.

Cînavê Li Hev Xistî ya Bi "**ji**"

**Mînak:**

Min **ji wî**re name şand. / Min **jê** re name şand.

Cînavê Li Hev Xistî ya Bi "**di**"

**Mînak:**

Wan **di wê**de wane xwendin. / Wan **tê** de wane xwendin.

Cînavê Li Hev Xistî ya Bi "**li**"

**Mînak:**

Min **li wî** xist. / Min **lê** xist.

Dema em tameşeyî mînakên li jor dikin, dibînin ku li cihê "**bi wê, ji wî, di wê û li wî**" cînavên li hev xistî yên weke; "**pê, jê, tê, lê**" hatine bikaranîn.

Herwiha em têdigihin ku di çêkirina van cînavan de "**b**" cihê xwe ji "**p**" yê, "**d**" cihê xwe ji "**t**" yê re dihêle. Dîsa em têdigin ku nêrzatî û mêzatî ji holê tê rakirin û li cihê "**î**" û "**ê**" herduwan jî "**ê**" tê bikaranîn.

## 8- Cînavên Xwemalî

Ev cînav di bingeh de veqetandeka dikeve navbera nav û hevalnav yan nav û nav de ye. Dema navê destpêkê dikeve, ev veqetandek dikeve cihê nav û weke cînavê xwemalî tê binavkirin. Lewra dide xwîyakirin ku ew xwemalê nav yan cînavê li pey xwe ye.

**Mînak:**

**Mazlûm**ê zer çû dibistanê. / **Yê** zer çû dibistanê.

## PÊKANÎN

**1- Hevokekê sazbike, bila cînavekên xwemalî yekê kesî têde hebe û wê hevokê çareser bike.**

**2- Cînavên di hevoka jêr de bibîne û li ser her yekê ji wan hevokekê çêke.**

**"Min ew pênûs bi vê guhert û bi vê min name nivîsî."**

**3- Li ser her daçekekê cînavekê li hev xistî sazbike û van cînavan di nava hevokê de bikarbîne.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Em dikarin li gel kirekekê (cînav) tewandî, pêkirekê tewandî bikarbînin? Ger ne, çima?

2- Çima cînavê tewandî nikarin bibin kirekê hevoka kiryari ya demê niha û demê bê?

## LI GEL NAV HATINA CÎNAVAN

Dema bi her şeş cînavên destpêkê re nav tên, ew dibin hevalnav.

**Mînak:**

**1- Cînavê kesî**

**Wê** stiran got. / **Wê** hevalê stiran got.
*Cînav* *hevalnav*

**2- Cînavê nîşandanê**

**Wî** bide min. / **Wî** kopalî bide min.
*Cînav* *hevalnav*

**3- Cînavê pirsyarî**

**Çendan** xwarin nexwarine? / **Çend** hevalan xwarin nexwarine?
*Cînav* *hevalnav*

**4- Cînavê nediyar**

**Hinek** nehatibûn ezmûnê. / **Hinek** xwendekar nehatibûn ezmûnê.
*Cînav* *hevalnav*

**5- Cînavê jimarî**

**Sêyan** dariştin nivîsîbûn. / **Sê** xwendekaran dariştin nivîsîbûn.
*Cînav* *hevalnav*

**6- Cînavê vegerok**

**Xwe xwe** çû dibistanê. / Evîn **xwe xwe** çû dibistanê.
*Cînav* *hevalnav*

Lê cînavê Li hev xistî û yê xwemalî, dema dikevin gel nav, li bingehê xwe yê kevin dizivirin.

### 7- Cînavê Li hev xistî

Ez **pê** re çûm. / Ez **bi wî** re çûm. / Ez bi **Dilawer** re çûm.

### 8- Cînavê Xwemalî

**Gul**a min qurmiçî. / **Ya** min qurmiçî. / **Gul**a min qurmiçî.
Cînav dikarin weke nav di nava hevokê de erk bigirin. Yanî dikarin bibin “kirek, pêkir, têrker, destpêk, salox”

## PÊKANÎN

**1- Hevokekê ya demê bûrî ya ku kirekê wê cînavê tewandî binivîse, hevsengiya kireka wê bi kîjan endamê re çêbuye, bide diyarkirin.**
**2- Cînavê kesî yê xwerû, weke kirek li gor hemû deman di hevokan de bikarbîne û hevsengiya kar ya di van hevokan de bi wî re bide diyarkirin.**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Sedemê em ji hevalnav re dibêjin hevalnav çiye? Ger mirov hevalnavê nîşandanê ji rex nav rake, wê bibe çi?
2- Gelo her navek mafê wî heye, çend hevalnavên wî hebin?

## C- HEVALNAV

Hevalnav; Peyvên navek yan çawaniya navekê didin diyarkirinin. Hevalnava çawanî, ew peyvên dema dikevin piştî nav yan piştî hevalnavek din, reng, dirûv û çawaniya wan didin diyarkirin.

Hevalnav, bi diyarkirina heyînan derdikevin holê. Ji ber wê sedemê bi tenê nayêne bikaranîn. Gelek peyvên hevalnavan hene ku dema bi tenê, têne bikaranîn, wateyekê din didin. Nimûne: "**Reş**" navê rengekê ye. Dîsa "**Sê**" navê jimarekê ye. Dema em "**reş**" têxin piştî peyva "**çav**", dibe hevalnav.

**Mînak:**

Çavên **reş** hatin kildan.
**Sê** heval çûn Rojavayê Kurdistanê.

Weke di mînakê de jî tê dîtin, dema peyva "**reş**" çawaniya "**çav**" û peyva "**sê**" jimara "**hevalan**" dide diyarkirin, wê demê dibe hevalnav.

### Taybetmendiyên Hevalnavan

**1-** Hevalnavên çawanî li pişt nav û yên din li pêşiya nav têne karanîn.

**Mînak:**

Xwendekarê **jîr** pelgeya yekemîntî girt.
**Hinek** gundî neçûbûn zozanan.
**Dû** hevalan çalakî pêkanîn.

**2-** Dema ku hevalnav bi tenê, tên bikaranîn, di rewşa nav yan cînav de ne. Ji ber ku dema dikevin piştî nav yan jî pêşiya nav û çawaniya nav yan nav bi xwe didin diyarkirin, dibin hevalnav.

**Mînak:**

Derya ya **spî**. / **Spî,**rengekciwane. **Wî** hevalî name nivîsî. / **Wî** name nivîsî.
*hevalnav* *nav* *hevalnav* *cînav*

**3-** Ji ber dema bi tenê, tên bikaranîn navin, dema dibin hevalnav pêvekên zayend, tewandin û komê nastînin.

**Mînak:**

Gula **sor**. / Gula **soran**, **sorê**, **sorî**

*hevalnav nav nav nav*

**4-** Di navbera hevalnav û navê ji aliyê hevalnav ve çawanî, jimar û ... tên diyarkirin de, bêhnok nayê bikaranîn. Dema bê bikaranîn ji rewşa hevalnavî derdikeve. Ji ber ku ew êdî tenê dimîne.

**Mînak:**

**Vê** nameyê binivîse. / **Vê**, name nivîsî.

*Hevalnav cînav*

**Ew** heval çûn. / **Ew**, hevalên minin.

*Hevalnav cînav*

**5-** Dikarin li peyv hev ji yekê zêdetir hevalnav ji bo navekê bêne bikaranîn.

**Mînak:**

Zanayê **çavreş,dilgeş,jîr**, **serbilind** hat dibistanê.

*hevalnav hn hn hn*

**6-** Li her cihê ku hevalnav çawaniya navekê bide diyarkirin, li wê derê raveka hevalnavan jî heye.

**Mînak:**

Xaniyê **mezin** hilweşiya.

*nav hevalnav*

*raveka hevalnavan*

**Baldarî**

Me beşên hevalnavan bi awayekê berfireh di pirtûka "*Rêzimana Kurdî - Refa Dû Amadeyî*" de, daye. Ji bo em van beşan bi awayekê giştî carek din bibîrbînin, pêwîste em çavxişînekê li ser vê jêderê re derbasbikin.

## PÊKANÎN

1- Hevalnavên di hevoka jêr de bibîne û erkê raveka wî hevalnavî di hevokê de bide diyarkirin.

"Wî hevalî kaxezek spî anî, danî ber xwe û li ser wê nivîsînek xweş û ciwan nivîsî."

2- Peyvên li jêr di hevokên cûr be cûr de weke hevalnav bikarbînin.

"wî, reş, baş, ciwan, jîr, bilind"

3- Ciyewaziya di navbera nav û hevalnavan de lêkolîn bikin û encamên we bidest xistî li lênûsa xwe binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Hûn dizanin hevalkar li kûdera hevokê tê bikaranîn, çima?
2- Hûn dikarin hevalkar û hevalnavan bi awayekê têgihiştî ji hev cûda bikin?
3- Me berê gotibû; di palvedêriya navan de, navê duwem wateyê navê yekem temam dike. Li gorî we pêwîste hevalkar wateya kîjan endama hevokê bide temamkirin?

## D- HEVALKAR

Berî em derbasî mijarê bibin, tê xwestin em bizanin ku di zimanê Kurdî de, mijar girêdayî hevin. Weke mînak; ji bo em bikaribin hevalnavan baş têbigihin, tê xwestin em nav û endamên hevokê baş nasbikin. Dîsa, kîjan nav, kîjan navî di aliyê wateyê de temam dike, bizanin.

Ji bo em hevalkaran jî baş têbigihin, pêwîste em kar û ravekên hevalnavan baş bizanin. Çawa hevalnav çawaniya nav didin diyarkirin, herwiha peyvên di bingeh de hevalkar yan hevalnavin, dema çawaniya kirina karê didin diyarkirin, dibin hevalkar. Yanî dema peyvek rewş, cih û ber, dem, jimara karekê yan saloxekê dide diyarkirin yan jî pirsê ji kirina karekê yan rewşa saloxekê dike, dibe hevalkar.

Weke di salên bûrî de jî hatîn dayîn, hevalkar di nava xwe de dibin pênc (5) beş.

### 1- Hevalkara Rewşî

Tevayî peyvên rewş û awayê kirina kar û rewşa saloxê diyardikin û di aliyê wateyê de kar û saloxan didin tamamkirin, jê re **hevalkarên rewşî** tê gotin. Ev hevalkar dibin bersiva pirsên “**çawa, bi çi awayî**”.

**Mînak:**

Ew**çawa** hat? Ew **xweş** hat.
Ew **bi çi awayî** hat? Ew **bilez** hat.

### 2- Hevalkara Cih û Ber

Tevayî peyvên cih û berê kar û saloxê diyardikin û di aliyê wateyê de kar û saloxan didin temamkirin, jê re **hevalkarên cih û ber** tê gotin. Ev hevalkar dibin bersiva pirsên “**ji kû ve, li kû**”.

**Mînak:**

Ew **kû ve** diçe? Ew **berjor** diçe. Ew **berjêr** çû.

### 3- Hevalkara Demî

Tevayî peyvên demê kar û saloxê diyardikin û di aliyê wateyê de kar û saloxan didin temamkirin, jê re **hevalkarên demî** tê gotin. Ev hevalkar dibin bersiva pirsên “**kengê, çi demî**”.

**Mînak:**

**Kengê** şoreş bilind bû? **Par** şoreş bilind bû.
**Buyer** çi dem rû da? **Danê spêdê** buyerê rûda.

### 4- Hevalkara Çendînî

Tevayî peyvên qasiya kar û saloxê didin diyarkirin û di aliyê wateyê de kar yan saloxê temamdikin, jê re **hevalkarên çendînî** tê gotin. Ev hevalkar dibin bersiva pirsên “**çend, çiqas**”.

**Mînak:**

Ew **çiqas** dixebite? Ew **gelek** dixebite.
Wê **çend** anîn? Wê **zêde** anîn.

### 5- Hevalkara Pirsyarî

Tevayî peyvên pirsê ji kar yan saloxê dikin, jê re **hevalkara pirsyarî** tê gotin.

**Mînak:**

Welatê we **çiqas** xweşe? Hozan di refê de nivîsînê **çawa** dinivîse?

**PÊKANÎN**

**1- Hevalkarên di hevoka jêr de bide diyarkirin û wan hevalkaran di hevokên cûda de weke hevalnav bikarbînin.**

**“Min nameyek xweş di refê de ciwan û zelal îro nivîsand.”**

**2- Li ser her cûrê hevalkarekê hevokekê sazbikin û hevokê çareser bikin.**

**3- Hevalkarên di hevoka jêr de bibînin û çareser bikin.**

**“Îro Sosin zû rabû, didanên xwe baş şûşt û pişt re berjêr çû dibistanê.”**

## XEBATÊN AMADEKARÎ

1- Hûn çi ciyewaziyê di navbera alav û navan de dibînin?
2- Li gor we alav dibin peyv yan ne? Ger ne, çima?
3- Mirov dikare bêje hemû alav di aliyê wate û erkdariyê de wekheve yan ne? Ger ne, çima?

## 3- PEYVÊN ALAV

Peyva alav, bi serê xwe ti wateyê nade, lê di karanîna hevokê de watedar dibe yan erk hildigire.

### Beşên alavan

#### a- Alavên Bangkirinê

Ew peyvên bangî yên ku dema di hevokê de tên bikaranîn û rewşek bangî bi hevokê didin qezençkirin, jê re **alavên bangî** tê gotin.

**Mînak:**

**Ey** heval! We têkoşîneke pîroz da.
**Wax** dayê! Lorînên te çiqas xembarin.

#### b- Alavên Sedemî

Dema alavên sedemî di hevokê de, hatin bikaranîn û sedem bi hevokê dan qezençkirin, jê re **alavên sedemî** tê gotin.

**Mînak:**

Kurd **ji bo** azadiya Rêber Apo têdikoşin.

#### c- Alavên Mercî

Dema peyvên weke; eger-ger, heke, heta di hevokê de, li ser kirekê hat zêdekirin û mercek bi hevokê dan qezençkirin, jê re **alavên mercî tên gotin**. Di hevoka mercî de, merc û seza hene.

**Mînak:**

**Ger** hûn bên, emê bên.

### ç- Alavên Girêdanê (gihanek)

Alavên girêdanê; peyv, birepeyv û hevokan bi hev ve didin girêdan. Ew jî evin; **“û,ku, jî, lê, lê belê, hem, yan**”

**Mînak:**

Hozan ji Rojava zivirî **lê** Zozan nezivirî.
Xwendekar **û** mamoste çûn pîrozbahiyê.

### d- Alavên Daçekî

Alavên daçekî, di karanîna hevokê de rewşek ya têdeyî, pêreyî, alî, jêreyî û liserbûnê didin çêkirin. Herwiha her pêşdaçekek dikare paşdaçekekê jî bistîne. Her paşdaçek dikare pêşdaçekekê jî bistîne. Hem pêşdaçek hem paşdaçek dikarin bêy hevdû bên bikaranîn.

Cûrên daçeka evin; “**di-de, bi-ve, ji-re, li**”

**Mînak:**

Me **di** wargehê **de** pîrozbahiya serkeftinê çêkir.
Min jê **re** name nivîsîbû.
Min **bi** pirtûkê zanîn da.



**PÊKANÎN**

**1- Ji bo her cûrek yê alavan hevokekê sazbikin.**
**2- Daçekên di hevoka jêr de bibîne û cûrê wê bêje?**
**“Min li gel mamosteyê xwe di refê de ji bo pêşxistina xebatên ziman dixwend.”**




**1- Peyv çi ye?**
a- Ji hevokên wate û erkê wan heman re peyv tê gotin.
b- Ji kombûna çend peyvên wate yan erkên wan heyîn re peyv tê gotin.
c- Ji birpeyvên ku wateyekê tenê tekûz dikin re peyv tê gotin.
d- Ji dengek yan ji kombûna çend dengên biwate, yan erkê wan heyîn re peyv tê gotin.
e- Ji peyv yan pêvekên bi hev ve tên zeliqandin û ji yekê zêdetir wateyê diyar dikin re peyv tê gotin.

**2- Ji peyvên jêrî kîjan dikare bibe peyva yek deng?**
a- Na
b- Başe
c- Erê
d- Raste
e- Here

**3- Kar çi ye?**
a- Kirina karê pêkirê têdigihîne.
b- Pêkhatina hevoka saloxî têdigihîne.
c- Kirina karê kirekê têdigihîne.
d- Pêkhatina birepeyvên hevokê sazûman dike.
e- Kirina kar nade diyarkirin.

**4- Kîjan ji gewdeyên jêrî ji koka kar çêbûye?**
a- Bezîbû
b- hilketiye
c- Şervan
d- Dildar
e- Keniye

**5- Kok dibe çend beş?**
a- 5
b- 3
c- 4
d- 6
e- 9

**6- Ji peyvên li jêr kîjan ne gewdeye?**
a- Girtîgeh
b- Melevanî
c- Şkest
d- Bazirganî
e- Aşxane
**7- Ji gewdeyên li jêr kîjan di demê bûriyê berdest de hatiye herikandin?**
a- Daxistiye
b- Daxistibû
c- Daxist
d- Dadixist
e- Dadixe
**8- Kîjan ji gewdeyên jêrî ji koka nav çêbuye?**
a- Hilketibû
b- Daxistiye
c- şkestin
d- daket
e- Direvand
**9- Ji endamên li jêr kîjan nabe salox?**
a- Ket
b- Sor
c- Xweş
d- Sosin
e- Dilbirîn
**10- Saloxa hevoka li jêr di kîjan demê de hatiye herikandin?**
"Heval, xwendekarek pir jîr û zana ye."
a- Demê bûriyê dûdar
b- Demê bûriyê berdest
c- Demê niha
d- Demê bê
e- Demê bûriyê çêrûkî
**11- Ji rawayên li jêr kîjan rawayek merciye?**
a- Diraza
b- Diraze
c- Razabuya
d- Biraze
e- Razaba

**12- Ji karên li jêr kîjan têpere?**
a- Bezîn
b- Revî
c- Xwend
d- Çûbû
e- Kenî
**13- Di hevoka jêrî de hevsengî di navbera kîjan endaman de çêbuye?**
"Şernas di refê de nameyan dinivîse."
a- Di navbera têrker û pêkirê de
b- Di navbera pêkir û karê de
c- Di navbera kirek û têrkerê de
d- Navbera kar û têrkerê de
e- Navbera kirek û karê de
**14- Di hevoka jêrî de hevsengî di navbera kîjan endaman de çêbuye?**
"Xwendekaran di pîrozbahiyê de stran gotin."
a- Di navbera kar û pêkirê de
b- Di navbera têrker û kirekê de
c- Di navbera kirek û karê de
d- Di navbera pêkir û kirek de
e- Di navbera têrker û pêkirê de
**15- Kara têper li kû dera hevokê cih digire?**
a- Destpêka hevokê
b- Nêva hevokê
c- Pêşiya têrkerê
d- Dawiya hevokê
e- Her çar jî şaşin
**16- Kara netêper bi kîjan endamê hevokê re her tim di nava hevsengiyê de ye?**
a- Bi têrkera hevalkariya rewşî re
b- Bi têrkera cihî ya têdeyî re
c- Bi kirek re
d- Bi têrkera hevalkarî ya demî re
e- Bi têrkera cihî ya li serbûnê re
**17- Di kîjan hevokên jêrî de kara tebatî hatiye karanîn?**
a- Jînda hat dibistanê.
b- Kovan hat mal û raza.
c- Em hatin û me dest pê kir.
d- Camê dibistanê hatin şikandin.
e- Hinek xwendekar nehatine dibistanê.

**18- Ji çareserkirinên li jêr kîjan ji bo navê “Gabar” yê di hevoka “Gabar çû şer.” de hatîbikaranîn, raste?**

a- Taybete, şênbere, yekjmare, nêrzaye, xweruye, kare
b- Giştiye, razbere, yekjmare, mêzaye, tûredaye, kireke
c- Taybete, şênbere, yekjimare, nêrzaye, hevgirtiye, kireke
d- Taybete, şênbere, yekjimare, nêrzaye, tûredayî ye, kireke
e- Taybete, razbere, yekjimare, nêrzaye, hevgirtî ye, pêkire

**19- Ji cînavên li jêr kîjan ne li hevxistî ye?**

a- Pê nivîsî.
b- Jê re kirî.
c- Pê ve rizî.
d- Jê derxist.
e- Da yê.

**20- Di kîjan hevoka jêrî de hevalnav hatiye bikaranîn?**

a- Wî, ew anî û da min.
b- Me ji bo wan ev kirî.
c- Wê, name ji min re şand.
d- Wê namê ji min re bişîne.
e- Wê, ev neşikandiba wê ji min re maba.

**21- Di kîjan hevoka li jêrî de hevalkar nehatiye bi karanîn?**

a- Ew xwendekar gelek jîre.
b- Diljîn di refê de baş dixebite.
c- Dozvan refa xwe xweşik dişû.
d- Min li dibistanê karkir.
e- Beybûn baş dixebite.

**22- Ji rêzkirinên li jêr kîjan ji bo cûrên alavan rastin?**

a- Bangî, mercî, pêwîstî, girêdan, gihanek
b- Daçekî, girêdan, sedemî, fermanî, mercî
c- Mercî, sedemî, bangî, girêdan, daçekî
d- Fermanî, mercî, bangî, daçekî, gihanek
e- Bangî, sedemî, pêwîstî, girêdan, daçekî

# BEŞA IV

## A- ZAGONÊN RASTNIVÎSÎNÊ

Ji bo em bizanin ka emê li ku kîjan tîpa mezin, kîjana biçûk bikarbînin, herwiha bizanin kîjan peyv biçûk, kîjan peyv mezin tê nivîsandin, pêwîste em “**Zagonên Rastnivîsînê**” fêr bibin.

### a- Nivîsîna Tîpên Mezin

**1-** Di nivîsînê de hevok bi tîpa mezin destpê dike.

**Mînak:**

Zozan hunermendek deng xweşe.

**2-** Di helbestê de her rêzikek bi tîpa mezin destpê dike.

**Mînak:**

Canê ji cemala te, muqedes qedesim ez
Ger xop û perî zade, nezerkî te besim ez

**3-** Tîpa destpêkê ya navên rojname û kovanran mezin tên nivîsîn.

**Mînak:**

Rojnameya Roj, Kovara Hewar

**4-** Navê pirtûkan û sergotarên mijaran piranî bi tîpên mezin tên destpêkirin.

**Mînak:**

Navê pirtûkê: Dîroka Wêjeya Kurdî
Sergotara mijarê: Taybetmendiyên Kirekan

**5-** Hevokên bi jimaran destpêdikin, piştî jimarê peyv bi tîpa mezin nayê destpêkirin.

**Mînak:**

1984’ê sala destpêkirina şerê çekdariye.

**6-** Hevoka ji yekê din tê girtin û di nava neynokê de tê nivîsîn, bi tîpa mezin tê destpêkirin.

**Mînak:**

Serok Apo got: “Hêvî ji serkeftinê birûmetire.”

**7-** Hevoka piştî cotxal (:) ê bi tîpa mezin destpêdike.

**Mînak:**

Xwendevan dibin dû beş: Yên guhdar û yên neguhdar.

**8-** Piştî hêmaya baneşan (!), nivîsîn bi tîpa mezin tê destpêkirin.

**Mînak:**

Hevalno! Em li rûmeta xwe xwedî derkevin.

**9-** Piştî sêxal (...) ê nivîsîn bi tîpa mezin destpêdike.

**Mînak:**

Li beramberî me çiyayên bilind... Gerok jî ji gera li ser wan pir hezdikin.

**10-** Piştî hêmaya pirsê (?) nivîsîn bi tîpa mezin destpêdike.

**Mînak:**

Tû çi dibêjî? Ji min re jî bêje.

**11-** Peyvên ji bo rêzdariyê tên bikaranîn, bi tîpa mezin tê destpêkirin.

**Mînak:**

Şehîd Karker
Birêz Şîlan

**12-** Navê sazî û rêxistanan yên ji peyvekê zêdetir çêdibin, tevayî peyvên wê bi tîpa mezin destpêdikin.

**Mînak:**

Saziya Malbatên Şehîdan
Wezareta Perwerdê

## b- Nivîsîna Navê Cihan

**1-**Navê cihên wek; "parzemîn, welat, herêm, bajar, bajarok, gund, semt, tax, rê, kolan û..." bi tîpa mezin destpêdikin.

**Mînak:**

Asya, Kurdistan, Botan, Sêrt, Giyadîn, Bana, Semta Ş. Xebat, Riya Mexmûr...

**2-** Dema navê "derya, çem, rûbar, çiya, gol, bêrm, tengav" bi navek yan hevalnavek din bên taybetkirin, herdû peyv bi tîbên mezin tên destpêkirin.

**Mînak:**

Derya Reş, Çemê Firat, Rûbarê Hîzil, Gola Nizmû, Tengava Stenbol...

**3-** Navên cihan yên ji yekê zêdetir navan pêkhatîn, bi hev ve tên nivîsîn.

**Mînak:**

Colemêrg, Sergeran, Mêrdîn, Kanîxezal...

**4-** Navên çiya, gir, robar, gol, derya yên hevgirtî, bi hev ve tên nivîsîn.

**Mînak:**

Çiyayê **Gabar**, Robarê **Masîro**, Çemê **Dîjle**, Girê **Çirav**...

## c- Nivîsîna Hatî Kurkirin

Nivîsîna navên kurtkirî, bi tîpên mezin tên nivîsîn.

**Mînak:**

Partiya Karkerên Kurdistan (PKK)

## ç- Nivîsandina Jimaran

Hêjmar bi nivîsandin yan jî bi reqeman tên nivîsîn. Her çiqas zagonek bingehîn nebe jî, lê hin zagonên weke qalib hatîn bikaranîn, rûniştine.

**1-** Dema jimar di nivîsandinên wêjeyî de bi nivîskî tê nivîsîn, hemû jimar ji hev cûda tên nivîsîn.

**Mînak:**

PKK di hezar û nehsed û heftê û heştan de hatiye avakirin.

**2-** Jimar di qada aborî de, di çek, sened û pelgeyan de bi hev ve tên nivîsîn.

**Mînak:**

Sêzdemilyonûçarsedhezar ji bo hesabê we hatiye şandin.

## d- Nivîsandina Navên Beran (alî)

**1-** Ger navê beran li destpêkê bên nivîsîn, bi tîpa mezin tê destpêkirin.

**Mînak:**

Bakûrê Kurdistanê

**2-** Ger navê beran di nava nivîsandinê de, bê nivîsîn, bi tîpa biçûk tê destpêkirin.

**Mînak:**

Baran li bakûr dibare.

## e- Nivîsandina Dîrokan

**1-**Di nava hevokê de navê rojan bi tîpa biçûk destpêdike.

**Mînak:**

Emê çarşemê biçin.

**2-** Navê roj, meh û dîrokên diyar bi tîpên mezin destpêdikin.

**Mînak:**

15’ê **T**ebaxa 1994’an roja **Ç**arşemê Heval Cemal daxuyanî da.

**3-** Nivîsandina dîroka rojê dikare bi reqem jî bê nivîsandin.

**Mînak:**

4’Nîsana 1949 - 04/04/1949

4- Ger dîrokek bi nivîskî hatibe nivîsandin, xal yan xîzik nakeve navbera wan.

**Mînak:**

4/Nîsan/1949 **şaş** - 4’ê Nîsana 1949 **rast**

## ê- Nivîsandina Navên Hevgirtî

**1-** Dema ji palvedariya navan û raveka hevalnavan, navek hevgirtî tê sazkirin, veqetandeka navbera wan radibe û herdû peyv bi hev ve tên nivîsîn û dibe peyvek hevgirtî.

**Mînak:**

| Palvedariya nav / Raveka hevalnavan | | | Navê hevgirtî |
|---|---|---|---|
| ***Nav*** | ***Veqetandek*** | ***Nav / Hevalnav*** | ***Nav*** |
| Dil | ê | birîn | Dilbirîn |
| Mar | ê | masî | Marmasî |
| Dil | ê | şad | dilşad |

Dema ji raveka hevalnavan peyvên hevgirtî tên sazkirin, carna nav û hevalnav cihê xwe bi hev diguherin.

**Mînak:**

| Raveka hevalnavan | | | Navê hevgirtî |
|---|---|---|---|
| ***Nav*** | ***Veqetandek*** | ***Hevalnav*** | ***Nav*** |
| Gul | a | sor | Sorgul |
| Xwîn | a | sor | Sorxwîn |
| Hinar | a | xweş | Xweşhinar |

Di karanîna raveka hevalnavan de, dema veqetandek radibe, nav û hevalnav cihê xwe bi hev diguherin, pêveka navgir (**e**) dikeve navbera wan, ev herdû bi hev ve nayên nivîsandin û xîzika navber dikeve navbera wan.

**Mînak:**

| Raveka hevalnavan | | | Peyva çêkirî | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ***Nav*** | ***Veqetandek*** | ***Hevalnav*** | ***hevalnav*** | ***Navgir*** | ***îzik*** | ***av*** | ***Birepeyv*** |
| Dar | a | sor | Sor | e | | ar | Sore-dar |
| Mih | a | reş | Reş | e | | ih | Reşe-mih |
| Giya | ê | kesk | Kesk | e | | iya | Keske-giya |

**2-** Hevalnavên hevgirtî, bi hev ve tên nivîsîn.

**Mînak:**

Reş + belek = reşbelek
Boz + belek = bozbelek

## F- Nivîsandina Cînavên Xwemalî

**1-** Cînavê xwemalî (**a, ê, ên**) her tim cûda tê nivîsandin.

**Mînak:**

**Ya** min ciwane.
Ew pênûs **a** wê ye.
Ew şervan **yên** me ne.

**2-** Ger peyvên "**a, ê, ên**" weke veqetandandek bên bikaranîn, bi peyva yekem ya birepeyvan ve tê zeliqandin.

**Mînak:**

Dar**ê** hişk
Gul**a** xweşik
Xwendekar**ên** jîr

## g- Nivîsandina Daçekan

Di karanîna hevokan de, daçek her tim ji peyvê cûda tê nivîsandin. Ger pêşdaçek, paşdaçekê nestîne jî, rewş nayê guhertin.

**Mînak:**

**Di** dibistanê **de**
**Bi** hevalan **re**
**Ji** bakûr **ve**
**Li** dîwar **re**
**Bi** agir neleyîze.

## h- Nivîsandina Pêvekên Erên û Nerênî

**1-** Pêvekên erênî û nerênî yên dikevin li ser koka peyva kar, pêve tên nivîsandin.

**Mînak:**

**Bi**kene.
Ve**na**xwim.
**Ne**çe.

**2-** Pêveka erênî û nerênî (**bi-bê**) yên dikevin li ser nav û hevalnavan, pê ve tên nivîsandin.

**Mînak:**

Kesê **bi**rûmet, camêr in.
Çiyayê **bi**dar hat şewitandin.

**3-** Dema pêveka erênî û nerênî (**bi-bê**) dikevin li ser hevalkaran, jê cûda tên nivîsîn.
Çiyayê Qereçûx **bê**dar ciwan e.
Zozanên me **bi**berfê xweş in.

## i- Nivîsandina Peyvên Pirsyarî

Peyvên pirsyarî her tim di karanînê de cûda tên nivîsîn.

**Mînak:**

Wê **çi** qas anî?
Ew **kî** ye?
Wî **çi** kir?

## î- Nivîsandina Hevalnavên Nediyar

Hevalnavên nediyar, ji ber ku dikevin pêşiya nav û cînavan, di navbera wan û nav yan cînavan de veqetandek nayên nivîsandin, lê ji hev cûda tên nivîsandin.

**Mînak:**

Her tim
Her kes
Her dû
Ew qas
Ev çend
Ti car
Ti kes
Hev dû

## PÊKANÎN

**1- Tîpa mezin li kû derê tê bikaranîn?**
**2- Di navan hevokê de, navê rojan bi kîjan tîpan destpêdikin?**
**3- Cînavên xwemalî di nava hevokê de çawa tên nivîsîn.?**
**4- Daçek di nava hevokê de bi peyvê ve tên nivîsandin? Ger ne, çima?**
**5- Peyvên pirsyarî di nava hevokê de çawa tên nivîsîn? Cûda yan pê ve?**
**6- Pêvekên nerênî û erênî yên li ser hevalkaran çawa tên nivîsîn? Pê ve yan cûda?**

## B- HÊMADANÎN

Ji bo cih û wateya peyv û hevokan di nivîsandinê de bê diyarkirin, hinek hêma tên bikaranîn. Ji vê karanînê re hêmadanîn tê gotin.

**Di zaraveyê Kurmancî de hêmayên hêmadanînê wiha rêzdibin:**

### 1- XAL (.)

**Cihên ku hêmaya xal lê tê bikaranîn:**

**a-** Dikeve dawiya hevokê.

**Mînak:**

Hevalên me di şer de serkeftinek mezin bidest xistin.

**b-** Ji bo nîşakirina jimara pileya heyî tê bikaranîn.

**Mînak:**

**1.** (emîn) 2. (emîn) 3. (emîn)

**c-** Li dawiya peyvên kurtkirî tê bikaranîn.

**Mînak:**

Dr. (doxtor), Prof. (profesor), P.K.K (Partiya Karkerên Kurdistan)

**ç-** Dema dîroka rojê tê nivîsîn, di navbera roj, meh û salê de tê bikaranîn.

**Mînak:**

15.02.1999

**d-** Di demjimêra bê mîl de, di navbera jimara demjimêr, hurde û çirkeyê de tê bikaranîn.

**Mînak:**

05.25.57

**h-** Di waneya bîrkarî de, li cihê hêmaya hevdanê tê bikaranîn.

**Mînak:**

2.20 = 40   40.5 = 200

**g-** Di waneya bîrkarî de, di navbera liqên jimaran de tê bikaranîn.

**Mînak:**

201 . 358 . 557
L.M  L.H  L.S

## 2- BÊHNOK (,)

**Cihên ku hêmaya bêhnok lê tê bikaranîn:**

**a**- Di hevokên dirêj û dema kirek ji kar dûr bikeve de, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ehmedê Xanî, helbestvanek mezin û navdare.

**b**- Di hevokê de di navbera peyv û birepeyvên di heman erkî de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Karker, Sorxwîn, Argeş û Sosin ji bo azadiya welat çûn çiyê.

**c**- Ji bo ji hev cudakirina rêze hevokan tê bikaranîn.

**Mînak:**

Hêzên Kurdan xwe perwerde dikin, şerdikin, serdikevin.

**ç**- Dema peyvên weke; "**erê, na, başe, dibe, serçavan**" yên ku girêdayî hevokên li pey xwe re tên, li pişt wan peyvan bêhnok tê bikaranîn.

**Mînak:**

Başe, emê her tim ji serbûriyên we sûd wergirin û bi gotina we bikin.
Erê, emê biçin çiyê.

**d**- Di waneya bîrkarî de, di navber hêjmara tam û hêjmara kertê de tê bikaranîn.

**Mînak:**

2, 3 (dû tam ji dehan sê)

**e**- Birepeyvên di nava hevokê de tên bikaranîn, li pêşî û li dawiya wan tê nivîsin.

**Mînak:**

Nivîskarê mezin, Qenadê Kurdo, li ser rêzimanê Kurdî baş xebitiye.

## 3- XALBÊHNOK

**Cihên ku hêmaya xalbêhnok lê tê bikaranîn:**

**a**- Di rêzehevokan de, di hevokên awênê wan cuda lê di warê bi hev ve girêdayînê de nêzî hev, ji bo cudakirina hevokên serbixwe tên bikaranîn.

**Mînak:**

Divê em ji Rêber Apo hez bikin; divê di riya wî de biçin lê divê em rûmeta wî bizanin.

**b**- Ji bo endamên ziman yên bi bêhnokan ji hev hatine cûdakirin wekî guruban cûdakirin tê bikaranîn.

**Mînak:**

Îşev ez hizirîm ku ji bo jiyanek demê xwe temamkirî, nedûrî nêzîkahî; nezehmetî, nehêsanî, neqehir, nehîskirin heye.

**c**- Dema navên di nava wan de bêhnok heyî, weke dû bir ji hev dû cuda bibin, di navbara herdû biran de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Deşta Mûşê, deşta Mêrdînê; deşta Geverê (Dizê), deşta Rimêlê

## 4- COTXAL

### Cihên ku hêmaya cotxal lê tê bikaranîn:

Cotxal hêmaya daxuyaniyê ye.

**a**- Dema di derbarê darezanekê de daxwiyanî bê dayîn, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Gulê got: “Di xewnên penaberekê de vegera welat, di xiyalên bindestekî de azadî heye. Dil li benda bexşandinek giştî ye.”

Min ji te ev fêmkir: tû nikarî vî karî serbixî.

**b**- Li pêşiya mînakên di derbarê mijarekê de bêdayîn, tên danîn.

**Mînak:**

Kiteyên dengkurt: Ji, ne, tû...

## 5- SÊXAL

### Cihên ku hêmaya sêxal lê tê bikaranîn:

**a**- Nivîsîna ji nivîsîna yekê din hatî girtin, peyv yan hevokên pêwîst nake bên nivîsîn, li şûna wan sêxal tê nivîsîn. Yanî ev hevok yan peyvên nehatîn nivîsîn, ger li destpêka nivîsînê be; sêxal dikeve destpêka nivîsînê, ger li nîvê nivîsînêbe; nîvê, ger li dawiya nivîsînê be; sêxal dikeve dawiya nivîsînê.

**Mînak:**

“...Ev xwendin û perwerde bi mirov çi nade têgihandin.”

**b**- Li cihê gotinên nayên xwestin bê gotin, tên bikaranîn.

**Mînak:**

Ji min re... got.

**c**- Dema em axaftina xwe di cihekê re ji bo hêzê bide têgihîna xiyalê yan raveyê bihêz bike, tê bikaranîn.

**Mînak:**

“Îro netixûb mane, neleşkertî û neşer...”

**d**- Ji bo ji xwendevan re bidî diyarkirin, rewş yan mînakên hatîn dayîn xilas nebûne, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Li vê herêmê her cûrê kulîlkan tê dîtin: sosin, beybûn, rihan...

## 6- HÊMAYA PIRSÊ

### Cihên ku hêmaya pirsê lê tên bikaranîn:

**a**- Hêmaya pirsê li dawiya peyv yan hevokên pirsyarî tên bikaranîn.

**Mînak:**

Gelo ji serxwebûnê xweştir çi heye?

Çi? Pirtûkê bîne.

**b**- Dû yan ji duwan zêdetir hevokên pirsyarî yên li pey hev tên, li dawiya wan tê bikaranîn.

**Mînak:**

Ev mirov çima li virin, çi dixwazin, li çi digerin?

**c**- Ji bo cih, dîrok yan rewşên nayên zanîn tên bikaranîn.

**Mînak:**

Cegerxwîn ( ? - 1984) xwedî hunerek hêja û dewlemende.

**d**- Li dawiya hevokên di wan de peyvên pirsyarî neyî lê tê xwestin weke hevoka pirsyarî bikarbînî, tê bikaranîn.

**Mînak:**

Tû diçî dibistanê?

**c**- Dema li ser agahiyekê guman hebe, li gel wê agahiyê, hêmaya pirsê di nava kevanokê de tê danîn.

**Mînak:**

Melayê Cizîrî di sala 1451 (?) an de ji dayîk buye.

## 7- BANEŞAN

### Cihên ku hêmaya baneşan lê tên bikaranîn:

**a**- Li pişt peyv û hevokên xurûş û sersormanê didin diyarkirin tê danîn.

**Mînak:**

Hey sanşa xirab! Ji mirinê nexweştire, ev koçberî!

**b**- Piştî bangên hezkirin û tirsê diyar dikin tê danîn.

**Mînak:**

Ax!Çi welatekî xweş, mîna bihûştê ye!

Heware! Agir bi malê ket.

**c**- Dema nivîsîna nayê bawerkirin dikeve neynokê, ji bo henek pê kirinê baneşan li ser wê nivîsînê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Dibêjin: "Şêrko buye wali (!) yê Şirnex."

## 8- XÊZIKA DIRÊJ

### Cihê ku xêzika dirêj lê tê bikaranîn:

Ji bo diyarkirina axaftinê, dikeve sererêzan.

**Mînak:**

- Ev ref ya we ye?
- Belê.

- Hûn çend demjimêran wane dibînin.
- Şeş demjimêran.

## 9- XÊZIKA KURT

### Cihên ku xêzika kurt lê tên bikaranîn:

**a-** Dema rêzika nivîsînê xilasdibe, peyvek neçarî parçebûnê dibe, li dawiya wê rêzikê tê bikaranîn.

**Mînak:**

Rêber APO ji bo azadiya hemû mirovên Cîhanê têkoşî-
nê dike.

**b-** Di xebatên rêziman de, ji bo girêdana kok û paşgir bide nîşakirin yan jî peyvekê bikiteyan bide dabeşkirin, tê danîn.

**Mînak:**

A-xîn, cot - yar, he - val - bend, şa - re - za.

**c-** Di navbera dû peyv yan jimarên girêdayî hev de tên bikaranîn.

**Mînak:**

Ceger-xwîn
1903-1984

## 10- XÊZIKA XWAR

### Cihên ku xêzika xwar lê tên bikaranîn:

**a-** Rêzikên helbestan li bin hev tên nivîsîn, dema pêdivî bi nivîsîna wan ya li rex hev bê dîtin, di navbera wan de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Dema dinê dibe bihar / Dipişkivin devî û dar

**b-** Di navbera dîrokan de û di navnîşanan de tê bikaranîn.

**Mînak:**

06/08/2014
Kawa Cûdî
Kolana azadî hêjmar : 72/ 24
Heskîf / ÊLIH

## 11- NEYNOK (DÛNIK)

### Cihên ku hêmaya neynok lê tên bikaranîn:

**a-** Peyv û nivîsînên ji kesekê yan jî ji çavkaniyekê hatine girtin û di nava nivîsînekî de hatî bicihkirin, di nava neynokê de tê danîn.

**Mînak:**

Rêber APO li ser xwendinê wiha dibêje; “Xwendin ronahiya jiyanê ye.”

**b**- Di nivîsînê de ji bo balkişandina li ser peyvekê jî hêmaya neynok tê bikaranîn.

**Mînak:**

Di tevayî perwerdeyên bi zimanê Kurdî tên kirin de "**Rêbaza Rêber Apo**" rêbaza bingehîne.

**c**- Dema em peyvek digirin nava neynokê, li ser wê peyvê hêmaya dabir nayê bikaranîn.

**Mînak:**

Di nava tekoşîna azadiyê "Sorxwîn"ê pir ked daye.
Şerê çekdarî "1984"ê destpêkiriye.

## 12- KEVANOK

### Cihên ku kevanok lê tên bikaranîn:

**1**- Di daxuyaniyên ku bi çêbûna hevokê ve negirêdayî de tê bikaranîn.

**Mînak:**

Hevalê Egîd (Mahsûm Korkmaz) sala 1986'an şehîd ket.

**2**- Di berhemên şanoyan de agahdariyê di derbarê kes yan jî dekorê de tên dayîn, dikevin nava kevanokê.

**Mînak:**

Hewar: ( Bi lêvken) banî hevala kir.

## 13- DABIR (BIREK)

### Cihên ku hêmaya dabir lê tên bikaranîn:

**a**- Di karanîna ziman de, dema jimar weke reqem tê nivîsandin, ew pêvekên ku ji bo tewandina jimarê tên bikaranîn, bi hêmaya dabir jê tê cudakirin.

**Mînak:**

21'ê Adara sala 1991'an li Cizîra Botan pêlên serhildana gel bilindbûbûn.

**b**- Dema pêvekên ne ji reseniya peyvên kurtkirî tên bikaranîn, bi hêmaya dabir jê tê cudakirin.

**Mînak:**

K.C.K'ê di derbarê pêvajoyê de daxuyanî da.

**c**- Piştî peyvên biyanî (Erebî), dabir ji bo nîşandana "**eyn**" tê bikaranîn.

**Mînak:**

'Erebî, Şi'îr, 'ilm...

## 14- Dûbare

### Cihê ku hêmaya dûbare lê tê bikaranîn:

Dema tiştek hatibe dûbarekirin, ji bo dubare neyê nivîsîn, li şûna wê hêmaya dûbare tê nivîsîn.

**Mînak:**

Ji jêdera "**çuyîn**" karan li gorî deman biherikîne.

1- Demê bê: Wê biçe
2- 〃 niha: Diçe
3- 〃 bûriyê xwerû: Çû
4- 〃 〃 berdest: Diçû
5- 〃 〃 çêrokî: Çûbû
6- 〃 〃 dûdar: Çuye

## PÊKANÎN

**1- Pêşdariya li jêr bi baldarî bişopînin û xwe bigihînin çareseriyekê rast.**

| | Xal | Kevanok | H.Pirsê | Bêhnok |
|---|---|---|---|---|
| Li dawiya hevokên pirsyarî tên danîn | | | | |
| Ji bo bêhnvedanekê kurt tê karanîn | | | | |
| Li dawiya hevokek asayî tê bikaranîn | | | | |
| Ji bo daxuyaniyên ku bi çêbûna hevokê ve negirêdayî tê bikaranîn | | | | |




**1- Tîpa mezin li kû derê tê bikaranîn?**
a- Li dawiya peyvê
b- Li nava peyvê
c- Destpêka hemû peyvên hevokê
d- Li destpêka navên taybet
e- Li dawiya navên giştî
**2- Tîpa mezin piştî kîjan hêmaya li jêr tê bikaranîn?**
a- Piştî bêhnokê
b- Piştî xalbêhnokê
c- Piştî kevanokê
d- Piştî dabirê
e- Piştî cotxalê
**3- Veqetandek li kû tê bikaranîn?**
a- Di navbera nav û cînavan de
b- Li dawiya hevoka navdêrî
c- Li pêşiya hevoka kiryarî
d- Di navbera palvedêr û palvedar de
e- Di navbera rêzkirina jimaran de
**4- Ji peyvên li jêr kîjan paşdaçeke?**
a- de
b- bi
c- ne
d- bê
e- di
**5- Hevalnavên hevgirtî çawa tên nivîsandin?**
a- Bi karê ve tên nivîsîn.
b- Bi saloxê ve tên nivîsîn.
c- Bi hev ve tên nivîsîn.
d- Bi daçekê ve tên nivîsîn.

e- Bi cînav ve tên nivîsîn.

**6- Cînavê xwemalî çawa tê nivîsandin?**

a- Bi pêkirê ve tê nivîsandin.

b- Ji hemû peyvan cûda tê nivîsandin.

c- Bi daçekê ve tê nivîsandin.

d- Bi alavên girêdanê ve tê nivîsandin.

e- Her çar vebirjêrik jî şaşin.

**7- Xal li kû nayê bikaranîn?**

a- Li dawiya hevokê

b- Ji bo nîşakirina pileya rêzê

c- Li dawiya peyvên kurtkirî

d- Li cihê hêmaya hevdanê

e- Her çar vebijêrk jî rastin.

**8- Bêhnok li kû tê bikaranîn?**

a- Li dawiya hevokên navdêrî

b- Li dawiya peyvên pirsyarî

c- Di navbera peyv û birepeyvên di heman erkê de

d- Li dawiya hevokên kiryarî yên hêsanî

e- Her çar vebijêrk jî rastin.

**9- Hêmaya cotxal li kû tê bikaranîn?**

a- Li dawiya hevokên navdêrî tê bikaranîn.

b- Li dawiya hevokên kiryariyên hêsanî tê bikaranîn.

c- Dema endamên hevokê weke gurub tên bikaranîn, di navbera wan de tê bikaranîn.

d- Dema di derbarê darezandinekê de daxuyanî bê dayîn, tê bikaranîn.

e- Ji bo ji hev cûdakirina nav û hevalnavan tê bikaranîn.

**10- Sêxal li kû nayê bikaranîn?**

a- Nivîsîna ji nivîsîna yekê din hatî girtin, peyv yan hevokên pêwîst nake bên nivîsîn, li şûna wan tê karanîn.

b- Li cihê gotinên nayê xwestin bên gotin, tê karanîn.

c- Dema em bixwazin nivîsîna yekê din di nava nivîsîna xwe de bicih bikin, em li cihê wê nivîsînê sêxal bikartînin..

d- Dema em axaftinên xwe di cihekê re, ji bo hêzê bidin têgihandina xiyalê yan raveyê bihêz bikîn, tê bikaranîn.

e- Ji bo ji xwendevanan re bidîn diyarkirin, rewş yan mînakên hatîn dayîn xilas nebuye, tê bikaranîn.

**11- Hêmaya pirsê li kû tê bikaranîn?**

a- Li dawiya hevokên rêzî tê bikaranîn.
b- Li dawiya hevokên mercî tê bikaranîn.
c- Li dawiya hevokên fermanî tê bikaranîn.
d- Li dawiya hevokên baneşanî tê bikaranîn.
e- Li dawiya hevokên pirsyarî tê bikaranîn.

**12- Baneşan li pişt kîjan peyvan tê bikaranîn?**

a- Peyvên darizandinekê didin têgihandin.
b- Peyvên nûçeyekê didin têgihandin.
c- Peyvên heyînekê didin nasandin.
d- Peyvên bangekê didin têgihandin.
e- Peyvên jimarekê didin têgihandin.

**13- Xîzika dirêj li kû tê bikaranîn?**

a- Di navbera kiteyan de
b- Di navbera peyvan de
c- Di navbera hevokan de
d- Ji bo diyarkirina axaftinê
e- Ji bo cûdakirina peyvên hevgirtî

**14- Xîzika kurt li kû tê bikaranîn?**

a- Li dawiya hevokê tê bikaranîn.
b- Piştî hêmaya baneşanê tê bikaranîn.
c- Di navbera kiteyan de tê bikaranîn.
d- Di navbera palvedariya navan de tê bikaranîn.
e- Di navbera raveka hevalnavan de tê bikaranîn.

**15- Xîzika xwar li kû tê bikaranîn?**

a- Di navbera dîroka rojê de tê bikaranîn.
b- Di navbera rêzkirina jimarên hêjmartinê de tê bikaranîn.
c- Di navbara dû hevalnavan de tê bikaranîn.
d- Di navbera dû hevalkaran de tê bikaranîn.
e- Di navbera pêkir û kirekê de tê bikaranîn.

**16- Neynok li kû tê bikaranîn?**

a- Ji bo pêvekên kêşanê ji jimarê bên cûdakirin, tê bikaranîn.

b- Ji bo balkişandina ser peyvekê tê bikaranîn.
c- Ji bo berdewamkirina axaftinê tê bikaranîn.
d- Ji bo berdewamkirina darezandinekê tê bikaranîn.
e- Ji bo gihandina nûçeyekê, daxwazekê yan buyerekê tê bikaranîn.

**17- Kevanok ji bo çi tê bikaranîn?**

a- Tenê ji bo navê taybet tê bikaranîn.
b- Tenê ji bo navên yekjimar tê bikaranîn.
c- Tenê ji bo navên pirjimar tê bikaranî.
d- Ji bo di nivîsînê de bicihkirina axaftina yekê din tê bikanîn.
e- Her çar vebijêrk jî şaşin.

**18- Dabir bi çi armancê tê bikaranîn?**

a- Bi armanca pêveka tewandinê ji peyvên kurtkirî yan dîrokan cûdakirinê tê bikaranîn.
b- Bi armanca rêzkirina navan li peyv hev tê bikaranîn.
c- Bi armanca ji hev cûdakirina navên hevgirtî tê bikaranîn.
d- Bi armanca vekirina wateyê tê bikaranîn.
e- Bi armanca sazkirina hevokên hevgirtî tê bikaranîn.

**19- Hêmaya dûbare li kû tê bikaranîn?**

a- Dema hevoka pirsê hat sazkirin, li dawiya wan tê bikaranîn.
b- Dema peyvên ji hev cûda li bin hev tên nivîsîn, li şûna wan tê bikaranîn.
c- Dema peyvek li bin hev tê dûbarekirin, li şûna dûberekirina peyvê tê bikaranîn.
d- Piştî hemû hevokên ku bi armanca pirskirinê hatîn sazkirin, tê bikaranîn.
e- Dema peyvên ji heman cinsî tên rêzkirin, li cihê wan tên bikaranîn.

**20- Ji hêmayên li jêr kîjan li dawiya hevoka temamkirî nayê bikaranîn?**

a- Cotxal
b- Baneşan
c- Hêmaya pirsê
d- Xalbêhnok
e- Xal


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeyca
Tirkiye
KURDISTAN
Nahcevan
Iran
Suriye
Iraq
Lubnan
Derya Sipi
Idir
Qers
Sewas
Erzerom
Bazid
Agri
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Wan
Qotur
Xoy
Elbistan
Meleti
Farqin
Bitlis
Basqale
Semsur
Firat
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Zaxo
Urmiye
Entap
Riha
Veransehir
Nisebin
Cizir
Nexede
Qamislo
Dihok
Mihabad
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam